

ARMANC  
Ji mehê  
carekê  
dertê  
Hejmar: 95-96  
Tebax-Îlon  
1989  
Buha: 10 Skr.  
2.5 DM

# Armanc

SERXWEBÛN DEMOKRASÎ SOSYALÎZM

ARMANC  
Monthly  
Kurdish  
Magazine  
No: 95-96  
August-Septem  
1989  
Price: 10 Skr.  
2.5 DM

Xelkê dukujin, gunda vala dikin, nahêlin  
gundî herin ser erdên xwe...

## Li Sêrtê û Hekariyê provakasyonên Dewletê

■ Dewlet nahêle gundî ji gundên xwe derkevin herin bajêr, zozanan, dewarên xwe derxin dervayî gund, herin nav zeviyên xwe. Tene(mah-sûl) li ser benderan, dewar di axuran de mane.

■ Dewlet bê pirs û kontrol her kesê ku jê şikê dike, dide ber gulan. Li herêmê her kes qala terora dewletê dike.

■ Ji ber terora dewletê bi hezaran kes herêmê terk dikin, direvin bajarên mezin.

■ Gundîyan tirs şikandin. Êdî kirinên dewletê eşkere dikin, protesto dikin, li ber xwe didin.

■ TEVGER: "Berterefkirina vê xeteriyê, pûçkirina planên hêzên ked-xur û zordar girêdayî ye bi hişyarî, berpirsyarî û taqeta têkoşîna hêzên civakê yê xebatkar, ronakbîr, pêşverû û demokrat ve".



Deh hezaran gundî ji ber teror û barbariya dewleta kolonyalist dev ji erd û warên xwe berdan, rîya xwe dan bajarên mezin

Dewleta kolonyalist ev du-sê mehên havînê li Kurdistanê. nemaze li herêma Sêrt û Hekariyê terorek mezin li dar xistiye. Dewlet gundên girêdayî qeza Şirnexê, Cinêvir, Dehrebân, Ramura, Gurmeç, Sîpindarok, Çala, Çab, Behrahincî, Ramuran, Benezur, Avtahl, Talya, Çemêmezî, Barazan, Bişyeraç, Hevke, Beste, Çemkatenlu, Serka, Bîrikan, Guhdên, Zivîrgok, Miştake, Amuriya, Bervekir, Nanîp, Girêsipî, Gîver û Gundik dixwaze vala bike. Ji van gundan hinek hatine valakirin jî. Li mintîqa Erûhê jî, Gervîş, Mizgeft, Xîrbêdikê, Bîloris û Goyinan bi temamî, Tanze, Şakirkaniyê û Celekan

jî bi qismî hatine valakirin. Hin gundên herêma Goyan û Baykanê jî hatine valakirin.

### Dewletê gund bi tesadufî hilnebijartin

Destpêka meha Tîrmehê  
leşkerên Tirk girtin ser

### Samî Abdurrehman:

"Cepha Kurdistanê Iraqê remza  
yekbûna milletê Kurd e"

rûpel:3

Dr. Qasimlo ji demokratbûna xwe  
ket feqa Eceman

rûpel 4

gundên Şirnexê Gundik û mezrayên wê. Mêr û jinên gund cihê cihê civandin. Jin tazî kirin, bi zilaman jî îşkencê kirin. Piştî îşkence û zilmek giran teblîxata qeymeqamê Şirnexê Cemal Ayhan jî gundiyan re xwendin.

Dûmahîk r. 9

Piştî şehîdbûna Dr. A. Qasimlo  
Hezaran Cînayeta  
îranê Ricimandin!



Roja 20'ê Tîrmehê bi hezaran Kurd li Parîsê civiyar serokên xwe Dr. Qasimlo verêkirin îstirhetgeha wî ya ebedî (Foto: Armanc)

Partiya Demokrat a Kurdistanê, TEVGER, Cepha Kurdistanê Iraqê liqê Skandinavya, Hevkarîya Kurdên li Sûriyê, Partiya demokrat a Kurd li Sûriyê, Hevkarîya Rêxistinên Siyasî yê Kurd li Swêdê û Federasyona Komelên Kurdistanê di 19'ê Tebaxê de,

piştî şehîdbûna Dr. Abdurrehman Qasimlo û herdu hevalên wî; Abdulah Qadirî û Fadil Resûl bi 36 rojan li Stockholmê li dijî rejîma îran a terorîst û sefaretxana Awusturya meşeke protestoyê pêk anîn. Piştî ku li ber sefaretxana îranê

Dûmahîk r. 11

Girtiyên siyasî carek din bi serketin

## Di berxwedanan de du şehîd !

Li dijî zulm û zordariyê û ji bo rakirina "Biryarna-  
ma 1'ê Tebaxê" girtiyên hefsên Tirkîyê û Kurdistanê  
dest bi grewa birçibûnê kirin

Di 32 rojên grewê de du welatparêzên girtî şehîd  
bûn. Di 52 rojên grewê de hukûmetê gav paş de  
avêt û daxwazên girtiyan qebûl kirin

Nûçeya wê r. 11





Rojeva Mehê

### Şehîdê mezin çi jibîr kir?

Çi qas rast, çi qas derew, neyê zanîn, lê tê gotin ku berî Dr. Abdulrehman Qasimlo biçe civîna guftûgoyan a Wîyanayê, xanima wî jê re gotiye ku "Qasimlo, ez ji te re dibêjim ku meçe, tu yê bibî Simko" Simko jî li ser daxwaza waliyê İrani çûbû guftûgoyan û bi bêbextî hatibû kuştin.

Ën ku wê rîwayetê neqil dîkin, dibêjin ku Qasimlo jî vegeyriyaye ser xanima xwe gotiye: "ez nabim Simko. Simko yekî serokeşîr bû, bi siyasetê nizanibû, ez dibêjim qey ez hinekî hay ji siyasetê heme ya din dema Simko û îro jî ne wek hev in. Berê hêsatir bû ku bi dekûdolaban, bi bêbextî insan têkevin feqîkan bîn kuştin, lê di dema me de ev yek ne wiha bi hêsanî kare bê kirin."

Lê Qasimlo çû, bû hevparê qedera Simko. Herçî qedera herduyan (gelek mixabin ku) wek hev derket jî tu carî nayê bîra meriv ku meriv Dr. Qasimlo û Simko bike yek. Berî her tiştî, dema ku ew tê de jiyân û rola ku di wê demê de listin ne wek hev bûn. Şexsiyeta siyasî ya Qasimlo û ya Simko jî dûrî hev bûn. Zirara wendabûna şexsiyeta Qasimlo ji bo gelê Kurd jî ya Simko gelek mezintir bû.

Ma gelo, Dr. Qasimlo di siyasetê de gelek nezan bû ku çû ket kemîna melayên İrani, yan jî tawîzkar û tesîfîmîyetkar bû? Ne yek jî. Berî her tiştî Dr. Qasimlo bi şerkarî, siyasetzanî û diplomasiya xwe serokekî mezin bû di nav gelê Kurd de. Meriv nikare wî neheq bike ku çima çû li gel İraniyan ji bo guftûgoyan rûnişt jî. Serokê miletekî ku ji bo azadî û xelasiya xwe tédikoşe çawa ku divê zanibe şer bike, gelekî jî wê zêdetir divê zanibe û karibe guftûgoyan jî bike.

Lê tişteke heye. Çi di şer de û çi jî di lidarxistina aştiyê de be, jiyana siyasî tehamula wê yekê neke ku valayî û xwejbîrîkirinek kurtedemî û muweqet jî têkave ber perspektîfên meriv. Meriv difikire ku gelo nebe ku valayî û xwejbîrîkirinek kurtedemî û muweqet perde xistin ber perspektîfên Qasimlo yê jiyaneke durrûdirêj a bi xebatkarî, siyasetzanî, demokratî û azdixwazî xemilandî. Çawa ku her xurtî û tekûzî noxtek wê ya zeif wek "paniya Aşil" heye, noxta herî zeif a Qasimlo jî İranîtiya wî bû, ku ez dibijim qey şertên welat ên zor ku wê dawiyê bi ser me de hatin valayî çêkir ku İranîti giraniya xwe daxê ser Kurdîti û demokratîtiya Dr. Qasimlo. Eger ne wiha bûya, gelo wê Qasimlo fikir nekirina ku yê taha-mula zerreya demokrasîyê li İranê nakin nikarin otonomîyê li Kurdistanê qebûl bikin. Ma wê fikir nekira ku heta tirêjên demokrasîyê di asoyên İranê de ronahî nedin, rîya guftûgoyan ji bo otonomîya Kurdistanê venabe? Lê xwiya ye dilsaftîya wî ya li ser İranbûnê ev yek jî bo demek kurt be jî pê da jibîrkirin.

Çi heyf ev valayî û xwejbîrîkirina kurtedem li ser me Kurdan gelek giran rûnişt.

### Xwendevanên Hêja

Ji bo derketina rojname an kovarek çak, rêk û pêk û zengîn hebûna redaksiyonek tenê, têr nake. Hebûn û pîrbûna nûçegihanana (muxabîra) gelek muhîm e. Ev rastî her jî bo Armancê jî wisa ye. Ji bo Armancek çaktirîn û zengintirîn me qampanya nûçegihaniyê vekiriye. Kesên ku bi me re, jî bo Armancek dewlemend milê xwe bide milên me, dikarin jî bo nûçegihaniyê muracaatê Armancê bikin. Di muraceata xwe de bi kurtî qala jiyana xwe bikin û jî bo qerta nûçegihaniyê du sûretên xwe ji me re bişînin. Kesên li welat an jî li dervayî welat dijîn, dikarin muraceat bikin. Redaksiyona Armancê heta serê salê bersîva hemû muraceatên hatine kirin, wê bide.

Redaksiyona Armancê

## 10 saliya Armancê 10 saliya Armancê 10 saliya

### Rohat

Li Ewrûpa bēnavbirî û bēsekinandin derketina weşaneke periyodîk di nav 10 salan de, karekî ewqas hêsa û piçûk nîne. Ji ber wê yekê ez rojnama Armancê bi dil û can pîroz dikim. Di nav van 10 salan de, ji aliyê tehr û naverokê de rojnama Armancê hertim pêş de çûye û an gorî hejmarên berê rûçikên xwe gelek guherandiye. Sînor û navçên xwe pêşdebirina kovar an jî rojnameke Kurdî gelek zêde û fireh in. Îro serêşî, problem û kelakela gelek pirsan çî li Ewrûpê û çî li Kurdistanê bê bersiv mane. Wek organeke netewî Armancê pêwîst e xwe bigihîne van warên nepenî. Asteng, dijwarî û çewtiyên li pêş rîya yekîtiya netewî bi vî tehrî dikarin derkevin ronahiyê. Di vî warî de, eger Armancê bikaribe babetên girîng, balkêş û ne zelal, bi munasebeta derketina 10 saliya xwe, bi rexneyên xwendevanan ve baş bêjîng bike, ez bawer dikim hem rojnama Armancê, hem jî têkoşîna gelê Kurd tozek be jî, dê firsendeke rind bi dest bixe.

### Cehwer Battê (Yunanîstan)

Berî her tiştî ez deh saliya Armancê û rojnamanavê wê pîroz dikim, jiyaneke durr û dirêj jê re dixwazim.

Dema ku ez Armancê dixwînim, bêyî ku ez zêde di nivîsên ku ez dixwînim û di serê xwe de wergerandinê bikim tê digihîjim, jî ber zimanê min e û ez bo wê yekê pîr kêfxêş im.

Her meh ez bi dilekî xweş li bendî Armancê xwe disekinim û ez dizanim ku ezê deng û bêjeyên ku hene bi zimanê xwe bixwînim. Ne weke Kurdistan Pressa me ku tenê nivîsa berpirsiyarê wê jî Tirkî tê wergerandin û çend nivîsên din ku gelek caran bo me hewqasî ferz nabînim. Wek doza Kurdistan di Kurdistan Pressê de bo kê tê nivîsin?

Bo ku zimanê Armancê bi Kurdî ye, serê min pîr pê bilind e, jî ber wek birê Mehmed Uzun di nivîsa xwe ya Kurdistan Press de (hejmar 73) dibêje: "Ziman e ku xelkekî tûne pê û giyanekê netewî ava dike. Xelkek bi zimanê xwe heye û serbilind e." Bi nêrîna min jî wilo ye û bawer im ku gelekê din jî di wê nêrînê de bi me re ne. Yê di bin zilm û zora Tirk de ye bi Erebi nikare bixwîne û tê bigihîje û yê ku di bin zilm û zora Erebe de ye nikare bi Tirkî bixwîne û tê bigihîje. Çiqas em di xwendina û nivîsandina zimanê xwe de li paş mabin jî, jî ber rewşa ku em tede ne divê em dest pê bikin bi zimanê xwe binivîsin û fêr bibin.

Bo ku em gelê xwe bi xelkên din bidine nas-kirin awayên din hene pêwîst nîne ku em di rojnameyên xwe yê rojane de bi zimanê xerîb binivîsin.

Tiştêkî ku di naveroka Armancê de zêde bû wê dawiyê (92.a) û ku ez gelek pê şa bûm rûpela 9 a yê nivîsa "Ne karê aqila ye, lê rast e" Belkî hinek bêjîng ku ev tiştên wilo ne karê rojnamekê ye, yê kovarake zanistî ye, lê di nêrîna min de îro tu kovarek wilo bi zimanê Kurdî tuneye.

Wekî din rûpelê sporê jî kême, lê bawer im ew jî jî ber ku miletê me heta îro ne gihaye ku serê xwe jî zilm û zorê rake û bikeve nav jiyana sporê. Lê dîsa jî mirov dikare bi kurtayî bahsa şampiyonê dinê û Ewrûpayê bike.

Bo 10 saliya Armancê ez dîsa wê pîroz dikim, serketin û serfiraziya we dixwazim.

### J. Espar

Armancî biya des serra. Raşteyê çê zî na yew xeberda weş a û pey na xeberî keyfê kê yeno.

Ez serrî ra vêşêr o ki Armancî rind taqîb keno. Wexto ki Armancî mi dest kuwena, ez verê hemîni qismê Zazakî akeno û zewqî reyra woneno. Çi heyf ki tena yew pel o, lezi qediyêno. Labelê lez biqediyê zî mi nê pelî ra hes kardo û mi hetî qiyemetê jey zaf o.

Ez wazeno derheqê peldê Zazakî di yewna çiy zî vaco. Hetonî ewro (eyrû) nuştêyê ki peldê Zazakî di veciyayî zafîney yîni tekstê folklorî bî. Bêgumon, edebiyatî ma Kurdon di folklor bi xwi yew cawo gelek muhîm gêno û no ware di yew xebata vêşî zî nêbiya. No semed ra karo ki folklorî ser o lazim o, gonî kê bikî û nê karon zî wîrdêk nêveynî. Hetta hezey zaf guron (girweyan) na mesela di zî ma gelekî erey mendî.

Labelê heze ki şarê ma vono "dardî ma yew û di wû des

niyo." Inay ser o zî kê wazeni sewbîna tewir nuştan zî Armanc di weynî. Mesela ma vacî eke gramer û imladey Zazakî ser o hergû omar (sayî) di toy bo zî bêro nuştîş, ardimê na xebatî zaf wendoxon reseno. Bi gore bê fikirdê mi, eke ewro Zazakî toy nusêno, yew sebebê jey zî derheqê wendîş û nuştîşê Zazakî di nezoneya ma Zazayon a. Gramer û imladey Zazakî ser o heme heway ra nêbo zî xebatî biya labelê nê nuştêy gelek vila yî. Hergû yew yew ca di çap biyo. Eke Armancî pelondê xwi di ca bido nuştandi onasarênon, wendoxon rî zî ason beno ki nê nuştan ra istifade weynî. Inay ra teber zî, eke nê nuştêy di-hîrê serrî Armanc di periyodîk vecî, kê benî wayirê yew dokumanê zaf erjîyayî.

Peynî di ez wazeno vaco Armancî wa zaf serronê onasarênon weyna û ez hêvî keno karo ki hetonî inkey (nika) kardo, hina vêşî aver bera.

### Ahmed Tigrîs:

## Rexnegirtin karekî hêsa ye, lê xebat gelek zor e

Xwerû bi Kurdî derketina Armancê jî bo me Kurdan bûyereke hêja û girîng e. Çend sal berê, li derê welat gelek kesên ronakbîr û polîtîk bi xwe nikaribûn bi Kurdî bixwînin û binivîsin. Lê îro li derê welat û bi taybetî jî li Swêdê bêhejmar Kurd êdî bi Kurdî dixwînin û dinivîsin. Di vî warî de rola rêxistin, komele, rojname û kovarên Kurdî gelek in. Bêguman rola Armancê jî, di wê xebata nîştîmanperwerî de çêbû û dibe. Lê jî bo ku Armanc hîn bêtir di vî warî de xizmetê bike û rola xwe ya weşanî bilize; li gor dîtina min divê redaksiyona wê li ser van xalên jêrîn baş bi-hizire û gavên pêşketî bavêje:

1- Nivîsarên durr û dirêj zêde çapneke. Heger hevpeyvînekê di 2-3 hejmaran de çap bike, herçiqas ew hêja be jî, xwendevan beşên pêşî jî bir dîkin. Ev karên weha yê kovarên periyodîkên teorîk, polîtîk û yê wêjeyî ne.

2- Cih nede nûçeyên kevn, yê ku çend meh, an çend hefte berê derçûne.

3- Armanc giranî û girîngiyê bide ser ziman, wêje û çanda Kurdî. Di wê xebatê de cih bide dîtînen cuda cuda.

4- Zimanê Armancê sivik e, lê zêde zêde bêjeyên Erebi, Farisî û yê biyanî tîn bikaranîn. Wek milî, kitêb, xeber, qerar û hwd. Bi ya min êdî piraniya xwendevanan Kurdiya van bêjan zanin. Divê mirov Kurdiya wan binivîse. Weha nebe Kurdî pêşve naçe. Di warê zimên de jî, divê kovar bi pêş de gav bavêje, ne ku raweste, an jî paşve here.

Êdî ew roj hatiye ku rojname û kovarên Kurdî di rûpel û quncîkên xwe de li ser ziman, rêziman û problemên wêjeya Kurdî gotûbêjan vekin. Bala xwendevanan bikşînin û rê pêş wan bikin. Bila herkes zanîn û dîtina xwe binivîse. Ya herî rast divê kovar û rojnameyên Kurdan ên Kurdî di nav xwe de van karûbaran pêk bînin. Rexne li ziman û rewşa weşanî û çapemeniyê bigirin.

5- Li gor Kurmancî, bi Soranî gelek tişt hatine nivîsandin, em Kurmanc û Zaza bi wan nizanin. Lê li Swêdê gelek nivîskar, helbestvan, mamoste û zimanzanayên zaravayê Soranî hene. Armancê kare di vî warî de jî bi wan re peywendîyan deyne û dîtînen wan bigire û xwendevanên xwe serwest bike. Lê mixabin piraniya kovar û rojnamên Kurdistanê Bakur ta niha an li ser jiyana wan an li ser xebata wan, bi wan re hevpeyvînen klasîkî çêkirine û dîkin. An jî jî nivîs û helbestên wan çend heb weşandine. Bi ya min ev têr nake. Gelo ew di çî prosesê de ne û problemên wan yê edebî, gramatîk, alfabetîk, devok û hwd çî ne? Ew jî bo yekbûna zarava û alfabeyan çî difikirin û çî dîkin?

Dîtîni diyarkirin û rexnegirtin karekî gelek hêsa ye, lê karkirin gelek zor e. Bi hêviya rojê serkeftin û serfiraziyê!

Redaksiyon: M. Eli, Zinarê Xamo, Hesen Mizgin, Lewend Firat, Mirza Bextiyar. Redaktorê berpirsiyar: M. Eli. Berpirsiyarê beşê Dimilkî: Malmîsanîj

Adres: Armanc P. Box: 6004 172 06 Sundbyberg Sweden

Telex: ATTN ARMANC 11083 TELE KC. Telefax: ATTN ARMANC 46-8-801825

Ansvarigutgivare: Kurdiska Demokratiska Arbetar Unionen. Postgiro: 50 37 99-9. ISSN: 0348 7385



**Samî Abdurrehman:**

## "Cepha Kurdistana Iraqê remza yekbûna milletê Kurd e"

**"Bi baweriya min di nav van 10-12 salên dawî de muhîmtirîn karê ku me kiriye avakirina Cepha Kurdistanê bûye." Samî Abdurrehman girîngiya Cepha Kurdistana Iraqê bi van gotinan dianî ziman.**

Di 29'ê meha Tirmehê de Serokê Partiya Demokrat a Gelî Kurdistan Samî Abdurrehman li Stockholmê li ser rewşa Kurdistana Iraqê ya îro civînek çê kir. Civîn, ji alî Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêd ve hatibû amadekirin.

Wek tê zanîn ji payîza par û vir de ye ku hin berpirsyarên rejîma Seddam carna beyana didin ajansên cihanê, dibêjin xwedêgiravî ew dixwazin bi hêzên muxalefetê re rûnin, bi wan re diyalogê deynin. Samî Abdurrehman di destpêka axaftina xwe de li ser vê yekê sekînî, got, du sebebên xaricî hene ku rejîma dîktator vê propogandayê dike. Yek, "Ev rejîm hewcedariya wê bi deyna heye. Îcar bi vî hawî dixwaze ji wan dewletên ku ji wan deyna dixwazin re bibêje 'mêze kin em rejîmek demokratîk in û dixwazin bi muareza xwe re diyalogê deynin' û bi vî riyê, ku karîbîn rûyê xwe yê reş li cihanê biguherînin".

Sebebên duduyan jî, S. Abdurrehman bi faktorên hundur ve girêda û got ku, "Di dema şerê Îran û Iraqê de bi navê fedekariyê û hwd. xelkê gelek tişt qebûl kir. Îcar piştî ku şer qediya, xelk dipirse, dibêje 'berê şer hebû, lê nuha çi heye?' Mesela, îro milyonek leşker di bin çek de ye. Ya din jî li Iraqê dîktatoriya yekpartîtiyê iflas kiriye, ew jî dixwazin xwe li gel bayê demokrasiyê ku îro li cihanê heye nişan bidin. Her bi vî armancê, par hilbijartin çêkin, gotin hilbijartin demokratîk û azad e. Lê ne partiyek muxalîf ket hilbijartinê û ne jî yek ji wan hat hilbijartin".

### Daxwaz ne diyalog e, teslim bûne

Li ser propoganda ku rejîma Seddam xwedêgiravî dixwaze bi muxalefetê re diyalogê deyne jî got, "ne rast e". "Rejîmê xwest ku Partiya Komunîst bibe Iraqê. Digotin; yek; ne danûstendina siyasî, efuyê bixwazin, dudu; danûstendin li derve nabe, divê li hundur be, sisê; her kesê ku bixwaze bi me re rûnê, divê bi tenê bê, em bi du hizba re rûnanin, çar; werin hundur demekê bimînin, heger ne bi dilê we bû cardin herin".

Li ser Kurdistana Iraqê jî S. Abdurrehman gelek rastiyan tahl anîn zimên. Got,



S. Abdurrehman: "Qet şik tune ku li Kurdistana Iraqê em tûşî şikestineke leşkerî bûn" (Foto: Armanç)

"Qet şik tune ku li Kurdistana Iraqê em tûşî şikestineke leşkerî bûn. Ne rast e ku em tu carî rewşa welatê xwe jî milletê xwe veşêrin." Li gor wî, du sebebên mezin ên vî şikestina leşkerî hebûn. Yek bikaranîna çekên kîmyayî, dudu jî, wêrankirin û şewitandina gund û bajarên Kurdistanê. Di vî warî de wêrankirina Qeladizê wek nimûne da û got, "100.000 nufûsa wê hebû, lê ji bin de wêran kirin.

### Biryara wêrankirina Kurdistanê

S. Abdurrehman koka siyaseta wêrankirina Kurdistanê ya îro gelekî bi paş de bir, bir gihand salên 1970'î. "Ji salên 1970'î de ye ku dixwazin Kurdistanê wêran bikin. Lê wê demê danûstendin hebû, 11'ê Adarê hebû. Tecilî sala 1974'an kirin. Merhela yekê di sala 1974'an de Kurd ji Kerkûkê, ji Zema, ji Xaneqîn û ji Şengalê, her dera ku petrol lê hebû bi dîr xistin. Merhela duduyan; piştî 1975'an gundên Kurdistanê bi kûrayiya 20 km. ji sinorên Îranê, Tirkîyê û Sûriyê wêran kirin. Yanî bi dirêjayiya zêdeyî 700 km vala kirin. Merhela sîsyan; sala 1977-78 ku li gel hemû çekên din, çekên kîmyayî jî bi kar anîn û gund bi gund şewitandin. Û ehlên gundan jî giş dil girtin. Xelkê mintîqa Germiyan hin jî di setê wan de dil in. Merhela çaran; bi Qeladizê dest pê kirin. Di 26'ê Hezîranê de fermanek derxist-

tin, gotin bajarên Iraqê yê li ser hudûdê Îranê û Tirkîyê bi kûrayiya 30 km wê bête valakirin, Wer xuyaye wê tu bajarî nehêlin."

### Karê herê baş: avabûna Cepha Kurdistanê

S. Abdurrehman li ser Cepha Kurdistanê jî sekînî, ji kar û barên wê hin nimûne da û got ku, "Bi baweriya min di nav van 10-12 salên dawî de muhîmtirîn karê ku me kiriye avakirina Cepha Kurdistanê ye. Bê yekbûn qet tu tevgerê azadî-xwaz serkevtin bi dest nexistiye. Cephe, îro di vî qonaxê de remza yekbûna milletê Kurd e."

### Şehîdbûna Dr. A. Qasimlo

#### xesaretek mezin e

S. Abdurrehman di beşê dawiyê yê axaftina xwe de li ser şehîdbûna Dr. A. Qasimlo jî got, "Heçî Dr. A. Qasimlo nasibe dizane ku xesaretek yekcar mezin bûye ji bo gelê Kurd, ji bo PDK-Î. Çimkî Dr. Qasimlo rêberê jêhatî bû, xwedî tecrube û rewşenbîr bû. Wî dixwest bi riyek aşîti mese-la Kurd hel bike".

Xulasa, meriv ji tevayîya axaftina S. Abdurrehman wisa têdigihişt ku tevgera Kurd a Kurdistana Iraqê, di merhela îro de ji serkeftinek çekadarî bitir baweriyê bi rê û qezencên diplomasiyê tine ku ev jî di tevgera Kurdên Iraqê de fenomenek nuh e.

**Rojnama Qerejdax:**

## Gelo rewşa Kurdan ji ya Tirkên Bûlgar çêtir e ?

Wêranşar: îro li Tirkîyê kî, bibêje Bûlgar zulmê li Tirkên Bûlgarîstanê dîkin baş e, rind e û rastiye dibêje; ji wê jî wêdetir wezîfa xwe ya "demokratiyê", "însanetiye" bi cî tîne. Lê li alî din dema yek bibêje, li vir Kurd jî tîn pelçiqandin, heta hebûna wan jî tê înkarkirin, navê zarokên wan jî bi zor tîn guherandin, a wê çaxê nabe; ger şexs be xayîn e, dijmin e ciyê wî zindan e, na ku rojname û kovar be cezayê wê jî qedexekirin e.

Rojnama "Qerejdax" jî di 18'ê Tebaxê de di hejmarê xwe ya 298'an de sêceki wiha kir; rewşa Tirkên Bûlgar û Kurdan da berhev, bi kurtî van dîtinên jêrîn nîvîsand:

"Li Tirkîyê herkes zulma li Tirkên Bûlgaran dibe mahkûm dike, rexne li hukumeta Bûlgarîstanê digre. Ew mahkûmkirin baş e lê, gelo li Tirkîyê jî hîn dijîti nabin? Mesela rewşa Kurdan... Ev millet

jî nikare bi zimanê xwe bi axifê û ji azadiya xwe ya milî jî bêpar e. Ew nikarin navê ku ew dixwazin li zarokên xwe kin, eger lêkin jî li nufûsê nayê qebûlkin. Berî her tiştî, bi zanebûn û bi plan rêlibergirtina pêşketina miletekî, qedexekirina zimanê wî, guherandina navên insanên û yê herêman kirinên barbar in û bêsaletî ye."

Bê guman mudûmûmê Weranşar jî wek hemû mudûmûmên Tirk, tahamulî nivîsandina vî rastiye nekir û rojname da topkîrin.

Li alî din, Sekreterê Komela Mafê İnsanî ya Ruhayê A. Muhsîn Melik jî belavokek belav kir. Di belavokê de li ser rewşa Tirkên Bûlgar û ya Kurdan sekînî, rexne li barbariya Seddam girt. Her wisa da diyarkirin ku neheqî bes li Tirkên Bûlgar nabe, li Kurdan jî dibe û ew jî tîn asîmlekin. Hukumeta Tirk jî zimanê Kurdî qedexekirîye, nahêle kes navên Kurdî li zarokên xwe kin.

## Komîta Piştigiri ya multeciyan ava bû

Anqere: Mebûsê Mêrdînê Ahmet Turk, mebûsê Diyarbekir Salih Sumer û mebûsê Meletiyê İbrahim Aksoy ji bo alikariya penaberên Kurd ku salek berê ji ber çekên kîmyayî jî Kurdistana Iraqê koçî Kurdistana Tirkîyê kiribûn, komîteyek alikariyê ava kirin. Ji bo vî yekê muracaetê Wezaretê Hundir kirin. Di muracaeta xwe de ev her sê mebûsên Kurd sedemên vî gavavêtina, hindikayîya alikariya dewletê û rêlibergirtina alikariya xelkê nişan dan. Wezaretê Hundur ku destûra civandina alikariyê ji bo penaberên Tirkên Bulgar dabû, destûr neda vî komîta Kurdan.

Wek tê zanîn ji bo penaberên Kurd, gelek komîte hatin avakirin, lê dewleta Tirk rê li ber hemû komîtan girt, nehîşt ku ji bo penaberên Kurd alikariyê bê bicivandin.

## Şerefname ji nuh ve çap dibe

Bedlîs: Li Bedlîsê Wezîrê Kulturî yê Tirkîyê Namîk Kemal Zeybek beyan kir ku wê pirtûka Şerefxan; Şerefname ji aliyê Wezaretê Kulturî ve, bi Tirkî bê çapkin. Zeybek li ser vî yekê weha got: "Me wek wezaret, di weşanên xwe de zêdetir pirtûkên ku nîrxê wan ê tarîxî û çavkanîti hene, girtiye rojevê. Şerefname jî eserek bi vî rengî ye".

Şerefname di sala 1597'an de bi Farisî hatiye nivîsandin. M. Emîn Bozaslan di sala 1965'an de ev pirtûka heja wergerandibû Tirkî. Piştî 12'ê Îlonê ev pirtûk ji aliyê cûntayê ve hatibû qedexekirin. Beyankirina çapkirina vî pirtûkê ji devê faşîstekî wek Namîk Kemal Zeybek, bixwaze nexwaze meriv dide fikirandin, gelo çima?

## International Medical Relief:

### "Multeciyanê Kurd hatin jehr kirin"

Londra: Bi navê International Medical Relief (Alîkariya Tibbî ya Navnetewî) mueseseyek Îngilîz da îspatkirin ku di meha Hezîranê de li kampa Mêrdînê 2000 penaberên Kurd bi jahriyek navê "Mercury" jahrdadayî bûne. Di meha Hezîranê de dema nûçeya 2000 penaberên Kurd ji aliyê Iraqê ve jahrdadayî bûne hat bihîstin, gelek dewletan jî vî nûçeyê bawer nekir, wek propoganda Kurdan lê mêze kir.

Piştî bûyerê, International Medical Relief du doktor û di bin serokatiya Gwynne Roberts de ekîbek televizyona ITN şand Mêrdînê. Vî ekîbê kamerayek piçûk bi dizî kir kampa penaberan, gelek sûret kişandin, bi gelek pêşmergeyan re hevpeyvîn çêkirin. Doktora jî ji wan kesên ku jahrdadayî bûne xwîn û îdrar girtin, bi xwe ra birin Îngilîstanê.

Piştî xebatên laboratuare derket ku ev kes bi jahriya Mercury ku ji teref ajanên Iraqê ve bi dozê mezin tevî nav nanên wan hatibû kirin, jahrdadayî bûne. Serokê ekîba televizyona ITN, Gwynne Roberts got, li doraliyê kampa Mêrdînê gelek ajanên Iraqê hene.



# Dr. Qasimlo ji demokratbûna xwe ket feqa Eceman

Halim Can

Di dawiya qirnê XX'an de di merkeza qîta kevn a cîhanê de li Wîyanayê dîroka şehîdkirina serokên Kurdan careke din tekerur kir. Serokê Partiya Demokrat a Kurdîstana Îranê Dr. Abdulrehman Qasimlo tevî berpirsiyarê Partiyê yê Ewrûpa û endamê Komîta Merkezî Abdulah Qadîrî û Dr. Fazil Resûl bi bêbextî hatin kuştin.

Qasimlo di hemû axaftinên xwe de digot: "pêwîst e meriv ji dîroka xwe dersê bistîne û xetayên ku bav û bapîrên me kirine meriv dubare neke." Lê îcar ew bi xwe ket feqa dijmin!

Gelo piştî ewqas sal Qasimlo nizanibû ku di Rohhilata Navîn de siyaset û dîplomasiyê li ser fêlbaziyê, dek û dolaban, a herî girîng jî li ser şiddetê û zorê ava biye? Gelo çawa dibê ku yekî wek wî zane û jir bi bêtêdbîrî çû bi Farîsan re rûnişt? Qey fikirîbû ku li Ewrûpayê cinayet nabin!

Ev deh sal e ku Kurdên Kurdîstana Îranê ji bo mafên xwe yê meşrû şerê çekdarî dikin. Wexta tevgera wan xurt bûye dijmin mecbûr maye bi wan re rûniştîye û guftûgo kirine. Ev guftûgo jî alî raya giştî ya Kurdan ve hatiye zanîn. Lê belê ev guftûgoyên dawî ku bi dîplomaten Îranê re kir û bû sebebê şehîdbûna wî, jî alî raya giştî ya Kurdan ve qet ne eşkere bû. Piştî kuştina Qasimlo, endamê Polit Buroya PDK-Î Abdulah Hesenzade di presskonferansa Parisê de eşkere kir ku guftûgoyên wan di Çîriya Paşîn a 1988'an û Çîleya Pêşîn a 1989'an de bi berpirsiyarên Îranê re dest pê kirine û ev, li ser dawza Îranê bi dizî maye. Di 40 rojîya mirina Xumeynî de gelo Îranê jî bo "rêhber" e xwe Qasimlo qurban hilbijartibû ku di wê rojê de pê re rûniştin. Yan jî Kurdan di qada şer de qezenc kiribûn lê di guftûgoyên li ser masê de wînda kiribûn?

Di vê nivîsê de mebesta min ne ew e ku li ser şaşîtiyê û kêmasiyên tevgera rîzgarîya Kurd û bêtêdbîrtiya serokên wan bisekinim. Tenê dixwazim çend gotinan li ser şehîdê Kurdîstanê bêjim.

Di dîroka Kurdîstanê de kesên wek Qasimlo zana, alim, belkî jî realist kê m hene. Rojnamên Ewrûpayê jî bona Qasimlo gotin "di dinyayê de serokê gerilla yê herî demokrat." Serokê Yekîtiya Doktorên Cîhanê yê kevn û Wezîrê Karûbarê Însanî yê Fransa Barnard Kouchner li ser goristana Qasimlo got ku, "di nava serokên 'Dinya Sêyemîn' de ez heyranê Qasimlo bûm."

Tê gotin, "kesê ku li dinyê darek av nedabe û heta li zarokê jî mîze nekiribe, ew kesê bêtêdbîrtiya serokên Kurdîstanê bû." "kesê ku li dinyê darek av nedabe û heta li zarokê jî mîze nekiribe, ew kesê bêtêdbîrtiya serokên Kurdîstanê bû."

Îcar Dr. Qasimlo 40 salan jî bo ku zarok di welatê xwe de

bextiyar û serfiraz mezin bibin, ji bo ku welatê xwe bi xwe îdare bikin, di qedera welatê xwe de rolekê bilizin û welatên xwe bikin cînet bi şev û bi roj xebat kir. Zaniyarî û qebiliyeta xwe di vê riyê de xerc kir. Bi dîplomasiya xwe ya hostayî dostên gelê Kurd pîr kir û bi eserên xwe yê ilmî mesela Kurd bi cîhanê da nasandin. Îro Kurdologên biyanî bêtêdbîrtiya Qasimlo ne mumkun e ku li ser rewşa Kurd û Kurdîstanê kitêban binivîsin.

Çend roj berî şehîdbûna wî, wexta min bi navê kovara Medya Guneşî pê re hevpeyvînek çêkir, wî, tesîrek mezin li ser min hişt. Bersîva pîrsan bi xwebawerî û bi Kurmanciyek

**Çend roj berî şehîdbûna wî, wexta min bi navê kovara Medya Guneşî pê re hevpeyvînek çêkir, wî, tesîrek mezin li ser min hişt. Bersîva pîrsan bi xwebawerî û bi Kurmanciyek zelal dida. Bi axaftina xwe bawerî dida meriv û bi tiliyên xwe jî ev bawerî tesdîq dikir. Di eniya wî qermîçokên qerardarî, di nêrînên wî de optimîzîm û di axaftina wî de jî hêvî hebû. Dilê wî paqij, dîtînen wî mulayim bû, belkî di jiyana xwe de gêreyek jî nepelçiqandibû. Modern, demokrat, aştxwaz û optimîst...**

zelal dida. Bi axaftina xwe bawerî dida meriv û bi tiliyên xwe jî ev bawerî tesdîq dikir. Di eniya wî qermîçokên qerardarî, di nêrînên wî de optimîzîm û di axaftina wî de jî hêvî hebû. Dilê wî paqij, dîtînen wî mulayim bû, belkî di jiyana xwe de gêreyek jî nepelçiqandibû. Modern, demokrat, aştxwaz û optumîst...

Di nava axaftina xwe de carna mesele jî digotin. Got ez di sala 1981'an de çûm Osloyê. Li wê Komelek Kurdan hebû. Di Komelê de bi navê Kurdîstanek serbixwe, demokratîk, sosyallîst û yekbûyî şîarek hatibû nivîsandin. Ji min re gotin ev şîar çawa ye?

Min got: "Baş e."  
Wan got: "wê gavê çima Partiya we jî wê şîarê naporiz e?"

Min got "li Osloyê hûn 12 kes in, dibê ku hûn wê şîarê binivîsinin û biparêzin. Lê e min 12 hezar pêşmerge min hene û cardin jî ez nikarim Kurdîstanek wiha ava bikim." Û dom kir, Pir caran rojnamevan jî ji



Dr. Abdulrehman Qasimlo (Foto: Armanç)

min dipîrsin "tu xewna Kurdîstanê serbixwe nabî" min digot: "siyaset ne xewne, siyaset li ser tiştên real tê însa kirin."

Baweriya wî bi demokrasiyê hebû û li gor wî di dinya me ya îroyîn de problemên herî mezin problemên demokrasiyê bû. Wî, pîlûralîzm diparast. Herçiqas digot, "di welatê ku wek Kurdîstanê de demokrasiyê vergiyê dixwaze", disa jî li gora wî demokrasiya herî xirab jî dîktatoriya herî baştir çêtir bû.

Aştixwaz bû, li dijî şer bû. Lê digot rejîma mellan em mecbûr kirin ku em li dijî wan şer bikin. Û digot, şerê me jî bo parastinê ye, şerê me jî bo aştiyê ye. Ji bo ku zarok şer nebînin, em şer dikin.

Azadîxwaz bû, azadiya jî bo eqaliyetê li gor wî ne azadî bû. Digot, "heger sibê azadiya me hebe û ku xelk nan nebîne bixwe, ew jî ne azadî ye." Wî, azadî bi bîngeha çîneyîyê ve girêda û berî her tiştî azadiya çîna zahmetkêşan diparast. Azadiya welatê xwe û gelê xwe berî her tiştî digirt. Bîndestiya gelên din jî hiç nedixwest.

Dîplomata bû, dîplomasiyê baş zanibû. Têkiliyên wî yê şexşî pîr bûn. Him zimanê sistema Rohhilat û him jî zimanê sistema Rojava baş zanibû. Di nava Sosyaldemokratên dinyayê de ci standibû û xwe bi wan dabû qebûl kirin.

Serokê Kurdan yê herî modern bû. Di dîroka Kurdîstanê de serokekî wek wî di sewiya profesoriyê de tunebû. Ilîmdariya xwe, qabiliyeta, zeka, zanebûna û jiyana xwe jî bo rizgarbûna gelê xwe feda kir. Şexsiyeta wî nehîşt ku di Kurdîstana Îranê de zêde partiyên Kurd çêbin.

Ne tenê di Rohhilata Navîn de di "Dinya Sêyemîn" de serokekî wek wî pêşketinekî pîralî kê m e. Wezîrê Fransayê bileheq ne digot: "Di 'Dinya Sêyemîn' de ez heyranê Qasimlo bûm."

Dr. Qasimlo ne jî şaşîtiya siyasetê xwe, jî demokratbûn û însanetiya xwe ket feqa Eceman.

## Stîriyên me

### Lawikê Berrîvanî

#### Ziman

Li ser ziman û zanebûna zimanekî gelek wecîze hatine gotin. Mesela, hatiye gotin ku;

-Ne ew zimanê wî ba wê qijikan çavê wî derxista.

-Ziman him dost e, him dijmin e.

-Ziman kîlîta dilan e.

-Zimanê şîrî mar jî qulê derdixe.

Ya jî:

-Zimanek merivek e, du ziman du meriv in.

Di jiyana de yekcarîna meriv rastî hin bûyerên wisa tê ku, wê gavê bêhemdî gotinek wecîza a li ser wê yekê wek burûskê di mejuyê meriv de dişîrçe.

Li min jî wer hat.

Ji bo ku Kurdên li Swêd jî tevî merasîma cenazê rahmetî Dr. A. Qasimlo û ya Abdulah Qadîrî bibin me 93 kesî bi hev re tiyareyek rakir. Lê çaxa ez dibêjim me "rakir" ne ku me wek hinekan revand, na na, me bi perê xwe rakir, yanî kirê kir. Bi me re du Swêdî jî hebûn. Yek; serokê Rêxistina Parastina Zarokan Thomas Hammarberg û ya din jî rojnemevan Elîn Clason bû.

Ji ber ku wîza çend kesî tunebû, li balafîrxana Parisê hinekî serî li me gerandin. Ji bo ku em bi wan re bipeyivîyana, divê yekî ku bi Fransîzî zanîba di nav me de hebûna. Mixabin, di nav 91 Kurdî de yek jî derneket. Xwedê kir ku du Swêdî bi me re bûn, axirê wan xwe gîhand gaziya me.

Elîn Clason bi "henek" got:

-A nuha di nav hewqas Kurd de yek kesê jî ku bi Fransîzî zanibe tune ye?

Di dêlî ku bersîva wê bidim, min got:

-Lê wê çaxê hûn jî bo çî bi me ra ne?

Tam wê gavê gotina "zimanek merivek, du ziman du meriv in" di mejuyê min de wek burûskê lê xist.

Lê çî heyf wê ev "burûsk" ne ya dawîn ba...

Piştî gorkirina cenazan keys ketê ku ji hemû perçên Kurdîstanê hin serokên Kurdan û T. Hammarberg li Enstîtuya Kurd bighîjin ba hev, li ser cîna-yeta Dr. A. Qasimlo û her du hevalên din û rewşa Kurdan bîstekê sohbetê bikin. Bê guman jî bo sohbetek wiha jî zimanekî muştêrek lazîm bû. Ev jî bixwaze nexwaze bû Îngilîzî. Mîlet sohbet geş kir. Bêyî Kurdên Tirkîyê hemû Kurdên perçên din tevî sohbetê bûn. Bes ji Kurdên Kurdîstana Tirkîyê deng dernediket. T. Hammarberg xwest ku li dîtina wan (bala xwe lê ye ez xwe jê berî dikim) jî guhdarî bike. Bê şik wan jî kercal dikir ku dîtînen xwe bibêjin. Lê bi kîjan zimanî? Mêrikê xerîb û heta Îsmet Şerîf Wanlî jî ne bi Kurdî û ne jî bi Tirkî zanibûn...

Axirê mala Kurdên Sûriyê ava be (esas minet jî tune ye, ji xwe em wan li ser xwe dihesibînin) gihîştin gazî û hawara me, dîtînen me jî camêrê Swêdî û yê din re tercume kirin.

Wecîza "zimanek merivek, du ziman du meriv in" carek din bi bîra min hat...

Di destpêka sala 1980'yî de hevpeyvîneke rojnamevankî Fransîz; Daniêl di kovara "Demokratîk Eğitme Doğru" hejmara yekê de hatibû weşandin. Li ser pîrseke li ser girîngiya zimên mêrikê Fransîz weha gotibû:

"Ez gelek rojnamevan û nivîskarên ku çûne Kurdîstanê (Qesta Tirkîyê ye) û hatine ji nêz ve nas dikim. Ew jî wek min jî tunebûna kesên ku bi zimanekî biyanî bizanibe gazîna dikin. Piştî ku rewş ev e, pîrê caran em bi agahdariyên çewt vedigerin. Ev yek bes ne jî bo rojnamevan û nivîskarên weha ye, jî bo turîstan jî wisa ye. Divê hûn jî bîr nekin yekî xerîb, bi ihtîmaleke herî xerab dikare mesela we bibe ji 3-4 kesên din re. Her Kurdekî welatperwerê ku bi zimanekî biyanî baş zanibe sîleheke propogandayê yê baş e..."

Di dawiyê de dibê ez bibêjim; divê hûn mesela zimanê biyanî hawakî ilmî bigrin dest. Di vê îstîqametê de divê hûn stratejiya xwe tespît bikin."

Di ser van gotin û pêşniyaran re 9 sal derbas bûn û ew jî li Ewrûpayê, lê hûn jî serokên me Kurdên Kurdîstana Tirkîyê xelk jî wan re tercumanîyê dike...



## Lêkolîn

Ehmedê Abdurehman Axayê  
kurê Şahîn Axa  
-4-

Evaye çîroka jîna min ji ewelê  
umrê min heya tarîxa sala 1976

## Şehîdkirina Şêx Abdurehmanê Garisî bi xayintî

Wê şevê pezek ji me re gurand me şiva xwe xwar. Wê şevê em mane li gund, sibê zû em çûne ser kaniya gund rûniştin. Şêx ji me re got: "Lazîm e hin ji me herin Arincê, hin ji me bimînin." Min ji Şêx re got: "Ya Şêxê min ez hevî dikim em hemî tev de herin Arincê. Hemî qonaxa çar seeta ye. Eger Arif Beg û Adil Beg li gundê Arincê bin gelek baş e, eger ne li gundê Arincê bin em hemî tev de paş de vegezin." Şêx Ji min re got: "Kes ji hevala deng nake ji te pê ve." Min lê vegezan: "Eşîra Xelîl û Xavîta herdu eşîr neyarên hev in yê herin Arincê eger rastî wan bêne wê wan bikujin. Ez hevî dikim tu me ji hevûdu nekî." Disa gote min: "Ez ji te ne razî me çî dema ez tedbîrêkî bidim, tuyê betal bikî, ez weha ji te qebûl nakim." Min lê vegezan: "Ya Şêxê min çima tu aciz dibî, disa weka xwe bike." Lê ez pîr aciz bûm, Şêx zanî ez aciz bûm, em hemî tev de meşîn heya gihîştin çiyayê Arnûsê Miksê. Çiyayêkî pîr mezî û bilind e, avên kaniya ji nivê çiyê de diherikin binê çiyê. Li milê rojhilat ve newalek kûr û fireh e, sê gund di newalê de ne. Em çûn ji milê rojava ve nivê çiyê. Li milê rojhilat em rûniştin. Riya ku diçe Arincê di nivê çiyê re diçe. Em man rûniştî qedere seetekê. Şêx Abdurehman gazî min kir: "Dilê xwe ji min negre, ez poşman bûm ew gotinên min ji te re dayîn." Min jê re got: "Ya Şêxê min tu çî ji min re çî bêjî ez naxeyidim, dilê min namîne." Ez û Şêx hatin cem hevala, ji hevala re got: "Wê kî here gundê Arincê?" Ji hevala Abdurehmanê Mihê got: "Ezê herim Arincê." Şêx du hevalên din ji pê re kar kirin, reşbeleka Xoybûnê ji da wan ji wan re got: "Wê reşbelekê bidin Arif û Adil Beg, wê hewe nasbikin."

Abdurehmanê Mihê digel herdu hevala meşî heya ji pêş çavê me ve winda bû. Hersê Ermenî gotin "Ya Şêx bêşerîtiye ku hersê tenê çûn. Eger takîbata Tirka rastê wan bê, hersê hindik in, nikarên dest helinin. Em hevî dikin hûn îzna me hersêya bidin em ê herin bigihên hevalên ku çûn." Şêx ji wan re got "ne hewce ye hûn herin." Disa hevî kirin. Me hemûya gote Şêx

"îzna wan bide bila herin." Şêx ji wan re got herin. Ew jî çûn heya ji ber çava winda bûn. Yê çûn Arincê, bûn(6) zilam.

Pişt re Şêx bi xef ji min re got "ez bi wa Ermenîya ewle nabim, ez ditirsim bêbextîkê li me bikin. Divê tu ji herî bigihayî wan, Abdurehmanê Mihê nezan e, eger hilekê li me bikin pê nizan e." Ez ji Şêx ewle nebûm bêjim ez naçim. Eger min bigota ez naçim disa wê Şêx bixeyîdiya. Min tivinga xwe da milê xwe, hevalek ligel min hat. Piştî çentê ku neşir û mohra Xoybûnê tede min dane Şêx em meşîn çûn heya em gihîştin hevalan. Em tevde meşîn çûn heya em gihîştin nêzikê gundê Arincê. Gund di newaleke kûr de bû. Me qasid rê kir gund, cem Osmanê Endelîp; muxtarê gund, seet sisêyê Erebî. Û me Abdurehmanê Mihê digel sê hevala rê kirin piştî gund, ez û hersêkê Ermenî em li cem hev sekinin, li pişt newalê em mane li hevîya qasidê xwe.

Seet bi 8'ê rojê, dengê tivingê hat ji paş me ve, li serê çiyê riya ku em tê de hatin. Ez rabîm ji piya, dengê tivingek din jî me sehkir. Bû dengê du tivinga. Min dûrbîn da serê çiyê, ew riya ku em tê de hatin, min kes nedît. Me du heval rê kirin serê kûpekî bilind rasta dengê tivinga jê hati, ewan jî tişteke nedît. Em man li çiyê xwe heya seet bû 9,30 Erebî, qasidê ku me rêkirî gundê Arincê, vegeziya hat cem me, ji me re got "muxtar ne hazir bû ez mam li hevîya wî heya hat. Ji min re got "ez destê Şêx maç dikim, jê re bêje Arif û Adil Beg digel hevalê xwe li cem men e, wê piştî mexribê bêne gund bîn mala me, bila Şêx û hevalên xwe kerem bikin bîn gund, mala me, emê işev tev de kêfeke rind bikin."

Yê qasid çewalek nan û penîr ji me re hanîbû. Me her yekê rahîst nan û penîrê xwe, em bi rê ketin ku herin Şêx û hevalên mayî binin ku em tevde vegezin herin gundê Arincê. Em meşîn gihîştin serê evrazî, bi mexrib. Em kêlekî rûniştin, em rabîn meşîn, nêzikê 10 mitra hevalê meyê di pêşiyê dimeşî li me vegeziya, bi tirs ji me re got "evaye laşê Şêx ketiye rê de." Dema me laşê wî dit,

me hemûya dest bi girî kir, me hemûya ji hev re got "kanî hevalên wî." Serê çiya ji erdê rast bû, ziyareteke jî li wê erda rast bî, navê wê, Ziyareta Şehîda bî, dora ziyaretê kavi bî. Laşê Şêx nêzikê ziyaretê bî. Me ji hev re got "yên Şêx kuştin di pişt kavi lî ziyaretê de ne." Me hemûya bi hev re hucûm da kavi lî ziyaretê me rênî kavi lî vala bû, me kes nedît. Em hemî bezîn çûn ser laşê Şêx. Me nêri laşê wî, serî ne bi laşê wî ve ye. Yekî ji hevala got ku "ev ne ku hevala Şêx kuştibe." Abdurehmanê

**Tivinga Şêx (Abdurehmanê Garisîyê) ji Necmo hilgirtiyê, Şêx li pêşiyê dimeşe ji paş ve tivingê berdidiyê li piştî wî dide di sînga wî re derdikeve. Şêx lê vedigere, tivinga di berdide li zikê wî dide di piştî wî re derdikeve. Şêx dikeve erdê, serê wî jêdike, diçe şaxa Hekariya serê Şêx datîne ber qaymeqamê Tirka.**

Mihê got "Xwedê mala kê xerab kiriye ku Şêx Abdurehman bikuje." Min ji wan re got "Necmo kuştîye." Wekî me taze rênî ku kêrika Necmo ketiya situkura wî, me hemiya kêrika wî nas dikir.

Evaye min ji hewe re beyan kir ku çewa Şêx Abdurahmanê Garisî hate kuştin şehîdê din û millet bi destê Necmoyê Sêrtiyê xayin.

Dem a em çûn gundê Arincê, me dom kir, sê heval mabûn li cem Şêx. Hersê ji westiya bûn. Şêx hersê paş de vegezan dibû gundê Ermişatê, Şêx û Necmo tenê mabûn. Herdû dimeşîn ku bêne cem me gundê Arincê. Tivinga Şêx ji Necmo hilgirtiyê, Şêx li pêşiyê dimeşe ji paş ve tivingê berdidiyê li piştî wî dide di sînga wî re derdikeve. Şêx lê vedigere, tivinga di berdide li zikê wî dide di piştî wî re derdikeve. Şêx dikeve erdê, serê wî jêdike, diçe şaxa Hekariya serê Şêx datîne ber qaymeqamê Tirka. Qaymeqam telefon dide waliyê Wanê ku "evaye Necmo Şêx Abdurahmanê Garisî kuştîye, serê wî jê kiriye aniyê cem

min." Wali lê vedigerîne ku Necmo zilamek derewçî ye, Şêx Abdurahman ne zilamek beredayî ye, belkî serê şivanekî jê kiribe." Dibêje "ku serê Şêx e, wî qeyd bikin li ser hêstirê siwar bikin binin gundê Westanê tirimbêl li wir hazir e wê Necmo binin Wanê cem min."

Ji wir pê ve em nizanin wali çawa kir ji Necmo. Ez dizanim ku efû kirin, gelek pere jî danê çû mala xwe Sêrtê. Pişt re hin şirhelal çûn di mala wî de çar demançe bi devê wî de teqandin, ruhê wî teslîmî cehennemê kirin.

Me çil mecidiyên ziv dane rênasê xwe me jê re got "tu laşê Şêx di nav ziyareta şehîda de veşêrî."

Yên Ermenî ji me re gotin "emê vegezin gundê Arincê, ji wê vegezin İranê, ji wir vegezin Sûriyê." Min qebûl nekir. Me riya xwe girt, em şunde vegeziyan hatin Ermişadê. Me gazî hersê hevalê xwe kirin yê ku Şêx paş ve vegezan dibûn. Hatin cem me em bi hevî û dil bi kul û bi girî vegeziyan hatin gundê Medresê cem Şêx Hesen birayê Şêx Abdurahman me tahziya wî kir. Ji me re got "ezê hevîkî ji we bikim, dema Tirka tengî li min kirin, ezê cevabê bidim hewe hûn bêne peyî min, ezê bême Sûriyê digel mala xwe û zarokên xwe. Me jê re got "ser çavê me, kingê te cewap da me emê zû bêne eger Xweda hes bike." Me xatir jê xwest em meşîn hatin heya cem ava Dicle, rojavayê Cizîra Botan Tirka ji ber Ava Hizil nêzikî Zaxo heya Cizîra Botan leşker danîbûn ber ava Dicle, çiyê borî. Yê rênasê me di kure borîk heye nas dikir, em tê re derbas kirin ji ava Dicle bi şev. Di wê şevê de em gihîştin Endiwerê Sûriyê. Sibê zû em çûne Bana Qesrê.

Ezê beyan bikim ku çima Şêx Abdurehmanê Garisî bi destê Necmoyê xayin û xedar hate kuştin:

Herçikê Necmo bî, zilamek pîr ne qenc bî. Li Tirkiyê pîr qebahet û ne qencyê wî hebûn, li Tirkiyê mahkûm bî, hukumeta Tirka Necmo girtin hefs kirin. Necmo hefs qul kir û revî û hepisçî jî ligel wî revîn, hin ji hepisçiyên girtin, hin jê xelas bûn.

Necmo ji Tirkiyê revî hate Sûriyê sala 1932, hate

cem Şêx Abdurehman gundê Bana Qesrê. Sebeb çibû hat cem Şêx. Şêx Yasîn Balleê ji bajarê Sêrtê zilamek pîr hêja bû xwediyê fabrikê bû, xalê Necmo bî. Ew û Şêx pîr dostê hev bûn û pîr ji hev hes dikirin. Bi we riyê Necmo hat cem Şêx.

Ezê beyan bikim ku çima Şêx Abdurehman bi destê Necmo hate kuştin: İbrahim Talî mufetişê umûmî bû li Diyarbêkrê. Gelek ji hereketên Şêx fikar dikirin. Mufetiş dizanî Necmo li cem Şêx e. Bi dizî hate Cizîra Botan mala qaymeqamê Cizîrê, rê kirin diya Necmo ji Sêrtê hanin Cizîrê. Mufetiş, qaymeqam û diya Necmo bi dizî rê kirin Sûriyê bajarê Endiwerê, Necmo ditin jê re gotin bi emrê mufetişê umûmî eger tu Şêx Abdurehman bikujî, hukumeta Tirka wê te efû bike û 500 zêra bide te. Necmo razî bû jê re got kingê ez firsatê bibinim ezê Şêx bikujim.

Firseta xwe dit her wekî me borandî di sala 1932 di hîva Hezîranê de.

Di van 6 sala de me xebatek pîr mezî û hêja kir, me ji milletê Kurd re digot lazîm e hûn xwe nas bikin, hûn Kurd in, ne Ereb in, ne Tirk in, û ne Faris in. Ji me re digotin wa nebêjin, em musulman in. Me ji wan re digot belê hûn musulman in lazîm e hûn bizanibin hûn Kurd in wacib e li ser hewe hûn qewmiyeta xwe nas bikin. Xebata ku me di van 6 salan de kirî gelek Kurd me şiyar kirin. Wilo çebû ku em rastê şivana, gavana dihatin, ji me dipirsîn ku Kurdên me wê kingê îstiqlala xwe bistînin.

Piştî kuştina Şêx Abdurehmanê Garisî ez li Bana Qesrê mam heya sala 1933. Ez zewicim çûme bajarê Dêrikê, min dukan ji xwe re vekir, disa min xebat dikir lê ez ji Sûriyê dernediketim

Ez hevî ji dost û evîna dikim heçî ku wê tarîxa jîna min û xebata ku min kirî ew bi çavê razibûnê lê birênin. Êdîtir her bijî Kurdistan her bijî Kurdên rast û hêja û qewmî.

Eva me nivîsî û bûrandî li ser qewmiyeta Kurd bû. Ji vir pê de emê binivîsin li ser xwedîkirina kuflet û ku çawa me zamanê xwe buhurand.

Dom dike



Sekreterê Giştî yê Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan Serhad Dicle:

# "Îro perestroyka bi çavekî nû li mîsyona dewleta huqûqî ya so-

-III-

## Perestroyka, glasnost û pirsgirêkên sosyalîzmê

**Pirs:** Hevalê sekreter, dixwazim ku bi meselek dawî em hevpeyvîna xwe temam bikin. Bi taybatî di van demên dawî de du peyv hene ku ji bal der û dorên siyasî tî munaqesekirin: Perestroyka û glasnost. Ev ji Rûsî ketin zimanê politikayê yê dinê. Di belavoka xwe ya ku bi navê Komîta Merkezi hatibû belavkirin, we beyan kir ku hûn piştgiriya bûyerên li Yekîtiya Sovyetan dikin. Li gor we, heta di vê yekê de hatiye derengmayîn. Çi ne perestroyka û glasnost û ji kîjan lazîmiyan derketin?

**Bersiv:** Sekreterê Giştî yê PKYS di kitêba xwe de ji bo perestroykayê dibêje ku: "Bêguman gelek peyv hene ku karibin tarîfa perestroykayê bikin. Eger ji van peyvên hevmane em bixwazin hîlbijêrin ka gelo ya herî nêzik mana perestroykayê dide kîjan e, em dikarin bêjin ku perestroyka şoreşek e". Li cihê din jî dibêje ku "perestroyka di sosyalîzmê de ronans e". Gava em van her du peyvên Gorbaçov raberî hev bikin, peyva "şoreş"ê wek peyveke radikalîst dikare bi meriv xweştir bê, lê ez tespîta Gorbaçov a ku dibêje perestroyka di sosyalîzmê de ronans e ji ya ku dibêje şoreş e, bêtir bi mane dibînim.

Gava em perestroykayê ji serûberiya milî (ya Yekîtiya Sovyetan) û ji ya qonaxa îroyîn derxin û hildin raddeyek tarîxî û navnetewî, wê xwiya bibe ku perestroyka bi rastî jî destpêka ronansê ye ku wê şoreşên gelek welatan ên ku Gorbaçov qesd dike ji bigre nav xwe.

Perestroyka û glasnostê li Yekîtiya Sovyetan dest pê kirin piştî 70 sal tecrûbên sosyalîzma reel derketin meydana. Ji bo ku destpêkeke, berî her tistî perestroyka, belkî lînhîrtînek nû ye li şaşitiyên buhurî di sosyalîzma 70 salan de li Yekîtiya Sovyetan. Lê rûdanan nîşan dan ku bûyer jî vê yekê berfirehtir û kûrtir e. Gorbaçov got ku, piştî em ketin navê, me dit ku mesele girantir e.

Loma jî hê kûrtir çûn û ditin ku bi riya awayê fiki-

randina nuh divê bi çavekî ji mesela şaşitiyan wêdetir li sosyalîzmê binêrin û qîmet bikin. Him jî bo perestroykayê him jî ji bo glasnostê mesele wiha ye. Loma jî perestroyka û glasnost û him jî çarçeva Yekîtiya Sovyet û him jî çarçeva xetayên sosyalîzma 70 salan derketiye. Ez bi xwe, perestroykayê ne bas ronansa sosyalîzma reel her wiha ya tevgera sosyalîzma îlmî ya cihanî dibînin. Ga-

hênanê û xusûsiyeta civakî ya merhela berhênanê, wê mirina sermiyandariyê û derketina sosyalîzmê bîne. Li gor vê, mulkiyeta civakî ya li ser aletên berhênanê û xusûsiyeta civakî ya merhela berhênanê wê li hev bikin û bi xwe re pêşdeçûna merhela berhênanê û hêzên berhênanê binin. Girêbendkirina ku sermiyandariyê aniyê, wê bê rakirin, civak jî nuh ve wê bi pêşkeve. Ev tespîtek rast e.

**Gava hat pirsîn ku çiyê mulkiyeta civakî ya li ser aletên berhênanê, welatên ku şoreşa sosyalîzmê bi ser xistin li gor xwe bersîvek danê: Ji şexsa girtin, gotin em dikin "civakî" bi qanûnan kirin malê dewletê û xistin bin îdara burokrasiya dewletê. Lê piştî 70 salan, em hatin gihîştin derekê; bêkalîtiya berhênanê, paşdemayina merhela berhênanê, xizmetneda na berhênanê ji bo civakê bi her awayî, bilindnebûna refaha gel wek ku dihat payîn û tiştên wek van derketin holê. Li ser sedemên van hatin rawestandî, lêkolîn çêbûn û hat gotin ku di sosyalîzmê de em hatine noxtek wisa ku ne "mulkiyeta civakî" lê "ya bêxwedî" çêbûye.**

va di sewiya dîrokî û navnetewî de lê dinêrim ez dibînim ku dema ronahîbûna tevgera komunist a cihanê bejn da-vê.

Esas peyvên "perestroyka", "glasnost" û "awayê fikirandina nuh" nayên manekê. Lê gelek nêzî hev in û tevihev bûne. Perestroyka hedefeke ku divê tê de bê biserketin; vê avabûna nuh e; glasnost jî wek rê û dirbên vê avakirinê derdikeve hemberî me. Lê di eynî wextê de glasnost, perspektîfên xwe nû avakirina demokrasiya sosyalîst e jî. Awayê fikirandina nuh jî himê teorîtîk ên biserxistina perestroyka û glasnostê ye.

Çiyê amadekirina himên teorîtîk? Ger me bes bi çavê qîmetkirina şaşitiyên buhurî li meselê binihêrtî, ihtiyacî ji awayê fikrandina nuh re tunebû. Mesele jê wêdetir e. Di hin pirsgirêkên esasi yên sosyalîzmê de teorî û zanebûnên me hebûn ku me ew rast dizanîn, tam dizanîn, yan jî pêşkeftirîn rê û dirb dizanîn. Lê îro derdikeve ku divê ji nuh ve em li wan zanîn û teoriyan vegerin. Ihtiyaciya awayê fikrandina nuh li vir derdikeve.

Wek tê zanîn tespîteka Marks heye ku dibêje; di-jayetiya navbera mulkiyeta şexsî ya li ser aletên ber-

Gava em vê tespîte dixin jiyane, jimeştirê em sedî sed baş nas dikin, lê piştî qonaxek pratîk, derdikeve ku hin tişt ne wek texmîna me ne ku me kiribû.

Gava hat pirsîn ku çiyê mulkiyeta civakî ya li ser aletên berhênanê, welatên ku şoreşa sosyalîzmê bi ser xistin li gor xwe bersîvek danê: Ji şexsa girtin, gotin em dikin "civakî" bi qanûnan kirin malê dewletê û xistin bin îdara burokrasiya dewletê. Lê piştî 70 sa-

çêbûn û hat gotin ku di sosyalîzmê de em hatine noxtek wisa ku ne "mulkiyeta civakî" lê "ya bêxwedî" çêbûye.

Lê Marks, ji dêvla mulkiyeta şexsî ne ku gotibû "mulkiyeta bêxwedî" lê gotibû "ya civakî" divê bê danîn. Gava perestroyka berê xwe bide vê meselê eşkere ye ku muhtacî awayê fikrê nû ye. Çimkî di derketine van meselan de her çend şaşitiyên şexsan hebûn jî mesele gelek jê wêdetir e. Divê em bersîvek nuh bidin pîrsa ku ka gelo "mulkiyeta civakî" çiyê. Berê me digot mulkiyeta civakî A ye. Lê îro dixuyê ku ne A, belkî A' ye.

Mesele mulkiyeta civakî û ya bêxwedî ji ku derket? Helbet ev, tecrûbên Yekîtiya Sovyet û yên Çînê jî tê de ji yên welatên sosyalîst derket. Xuya bû ku em mulkiyete ji şexsa bistînin û bidin dewletê û ji alî burokrasiyê bidin îdarekirin, ev yek bi otomatîkî mulkiyete nake ya civakî.

Dixwazim mîsaleke enteresan ji maqalekê binim ku min çendekî berê xwendibû: "Ji filozofekî pîrsîne ku kîjan muhîmtir e; kolektîf yan şexs. Helbet kolektîf, gotiye filozof, lê eger ew kolektîf jî şexsiyetan pêk hatibe. Çimkî netîca berhevbûna tekan her gav ji tekan mezintir e, lê netîca berhevbûna sifiran hergav sifir e". Nexwe, kolektîf berhevbûna însiyatîfa şexsî, şexsiyet, bikêrhatin îrade û mudaxela şexsan e. Em kolektîfekê bifikirin ku şexsiyeta dixê dereca si-

tê de tune ye ku bi vî yan wî awayî be, gelo mulkiyete wiha kolektîf e? Yan na, mulkiyeta kolektîf ew e ku şexsên civakê ji alî xwe de tiştêkî tê de dibînin, kar û zirara wan di vî yan wî halê wê de çêdibe?

Ev mîsalek e. Mîsalên din jî hene. Her wekî mesele tîkiliyên navbera partî û civakê. Partiya Bolşevîk a di serokatiya Lenin de, di şertên Rûsya Çarîti de ku qanûnên wê heqê pêşengiyê nedidayê tîkoşîn da, bawerîya xelkê bi xwe anî, li pey xwe kişand û şoreş bi ser xist. Di fiiliyatê de xwe îspat kir û pêşengî xist destê xwe. Şoreş bi serket. Partiya Komunist wek pêşengê civak û dewletê hat ser hukum û qanûn hat danîn ku partî pêşengê dewletê ye. Qanûndanînek wiha jî bo hin kadiran, ji bo partîya komunist a dema Lenin, di cî de bû. Xwe îspat kiribû û hatibû ser hukum.

Lê piştî re vê qanûnê zemînek wiha çêkir ku di tîkiliyên partî û dewletê, partî û civatê de hat nuxtek wilo ku, kadroyên ku şoreş nedîtibûn, heta hay ji girîngiya mesele tunebûn partî dagirtin, hinek bûn kadîrên pêşketî yên partiyê. Ev jî bîyî ku muhtacî tîkoşînek wek ya dema Lenin bin bûn "pêşengên" civakê. Çima ku wê qanûna me li jor bahs kir imtiyaz dida wan, bîyî ku xizmet bikin, bawerîya xelkê bi xwe bin hatin serî. Ne ku îrada civakê, wê qanûnê ev firset da wan. Lê niha perestroyka, berpêçûnek nuh tîne tîkiliyên navbera partî û dewletê, partî û civakê, ku gava komunist şertên komunistiyê bi cih neynin qanûn vê rolê nede wan.

Eger wê bibin pêşeng, divê bi rastî jî wek komunistan baweriyê bidin civakê, xwedî li guherandinên civakê derkevin, di sefên pêşî de bimeşin, ger bi vî awayî be bira bibin pêşeng.

Mîsalek din. Di demokrasiya sosyalîst de, mîsyonek heye ku jê re tê gotin dewleta huqûqî ya sosyalîst. Li gor Marksîzmê, dewleta huqûqî ya burjuwa, her çiqas behsa azadî, wekhevî û edaletê dike jî di esase xwe de ew diktatoriya burjuwazî ye, meriv dibê qey wekhevî aniyê, lê di fiiliyatê de wekhevîyek di nav hemwelatîyan de nîne. Baş e, gelo înkara îlmî ya vê çiyê? Berî her tiştî divê dewleta hu-

**Li gor Marksîzmê, dewleta huqûqî ya burjuwa, her çiqas behsa azadî, wekhevî û edaletê dike jî di esase xwe de ew diktatoriya burjuwazî ye, meriv dibê qey wekhevî aniyê, lê di fiiliyatê de wekhevîyek di nav hemwelatîyan de nîne. Baş e, gelo îmkana îlmî ya vê çiyê? Berî her tiştî divê dewleta huqûqî ya sosyalîst mafê wekhevîyê li hember qanûna di fiiliyatê de jî bide hemwelatîyan, divê naveroka azadiyê, wekhevîyê û edaletê dagire.**

lan, em hatin gihîştin derekê; bêkalîtiya berhênanê, paşdemayina merhela berhênanê, xizmetneda na berhênanê, jî bo civakê bi her awayî, bilindnebûna refaha gel wek ku dihat payîn û tiştên wek van derketin holê. Li ser sedemên van hatin rawestandî, lêkolîn

firê, netîca vê jî sifir e. Lê belê kolektîfek ku şexs, însiyatîf, rol, berpirsyarî û bikêrhatina xwe ya şexsî tîde didin diyarkirin, kolektîfa rastîn ev e. Gava em li mesele mulkiyeta kolektîf binêrin ji ku mulkiyete e ku tu kes xwedî lê der-nakeve, zirar û kara tu kesî



# mesela mafên hemwelatî, yalîst û dinê re"

quqî ya sosyalîst mafê wekhevîyê li hember qanûnan di fiiliyatê de jî bide hemwelatîyan, divê nave-roka azadiyê, wekhevîyê û edaletê dagire. Lê ji tecrûbên 70 salên sosyalîzmê ji yên Çînê, Kamboçyayê, ji yên welatên sosyalîst ên Ewrûpa Rojhilat hat dîtîn ku, heta îro demokrasîya sosyalîst ji alî huqûqên hemwelatî ket derecek wiha ku ji dewleta huqûqî ya burjuwa jî paşdetir ket. Her hemwelatîyekî dewleta sosyalîst li hember dewleta huqûqî nebû xwedî mafên wekhev.

Di dema Stalîn de hin politîka ji alî Komîta Merkezî û heta ji alî Stalîn ve hatin tespîtîkirin. Li hember kesên ku ew politîka nedecibandîn, ne ku bes Komîta Merkezî yan jî mewqûfê îdeolojîk ê Stalîn, organên dewletê jî rawestîyan. Muxaberat (istixbarat), mehkeme, polis û hetadezgehên ilmî li hember hin insanên hişk rawestîyan. Ji dêvla ku bi mewqîfê îdeolojîk li hember wan bê sekinandin, qanûnên dewletê hatin bikaranîn. Qanûnan jî îmtîyaz dan ên ser hukum, ên bi hêz û kesên ku wek wan nedîfîkirin bi çavê hemwelatîyê li wan nehat nihêrtin.

Stalîn, yan jî Mao bi taybetî di dema Şoreşa Kulturî de ev politîka da ber xwe. Kim Îl Sung, Çawuşesko yan jî serokên welatên sosyalîst ên din vê yekê dikin. Mesela Pol Pot, raste rast bû faciak mezîn...

Lê îro perestroyka bi çavêkî nû li mesela mafên hemwelatî, mîsyona dewleta huqûqî ya sosyalîst û hwd. dinê re.

Ê ku perestroyka û glasnostê dike destpêka dema ronahîyê û ronahîbûnê nû, ew xusûsiyeta wê ye ku li hemberî şexisperestiyê û pûtperestiyên hemû awayî radiweste. Xerakirin û serûbinkirin dema şexsperestiyê, her roj di rojname û televizyonan de tînin berçavkirin. Ev baş e. Lê ya jî vê baştir ew e ku berî her tiştî li hember pûtperestiyê fikra Marksîzmê radiweste. Heta îro, ev peyv gelek caran hat gotin, loma jî dibe ku em di ber guhê xwe re bavêjin û bêjin Marksîzm ilmek e, tu kes wek dînekî li Marksîzmê nane. Lê tecrûbên 70 salî yên sosyalîzmê îspat dikin

ku her çiqas me bi baran di kitêban de gotibe ilmê Marksîzmê, birûbawerîya ilmî ya Marksî-Lenîni, sosyalîzma ilmî û komunîzma ilmî jî, li welatên sosyalîst jî û li welatên din jî di partiyên komunîst de, di nav ronakbîrên Marksîst de, wek dînekî li sosyalîzmê hat nihêrtin. Ne hat fikirîn ku berî her tiştî Marks merivêkî alim û serokekî siyasî yê şoreşger bû, meriv bû. Ne pêxember yan jî munecim bû. Gava wî teoriya xwe, fikrên xwe ava kir ji karesatên (bûyer û delîlên) wê demê hereket kir û gîhaşt hin tespîtan. Teoriya Marksîzmê bi vî awayî derket, ne ku bi weh-yên ji Xwedê hatî, ne jî bi hin kehanetan.

Madem Marksîzm birûbawerîyek ilmî ye ku jî tehlîlîkirina dinya maddî çêbûyê, bi guherîn û nuhbûna dinya maddî divê xwe nuh bike. Mena vê yekê ew e ku gava Marksîstên îroyîn tehlîla dinê dikin nabe ku veşerî berî 100-150 sal berê; dewra Marks û di çarçewa ku Marks didit li dinyayê binêrin. Marks wê demê jiya û bi îmkân û delîlên wê demê gava li dinê nihêrt, dinya me ya îroyîn qasî çerçewa ku ew didin dît. Divê Marksîstên îroyîn jî li delîl, îmkân û hebûnên îro binêrin û li îro û sibê binêrin. Marksîstên îro divê ji Marks hê kûrtir û bi awakî dîtir li mesela sosyalîzma reel, qonaxa derbasbûna komunîzmê ji sosyalîzmê, mulkiyeta civakî, dewleta huqûqî ya sosyalîst pêwendiyên partî û dewletê, yên partî û civakê, pêwendiyên siyasî û ilim, eşkeretî, merkeziyaya demokratîk, rexne û xwexwekirinê binêrin. Gava em guhertinên dinê yên 150 salan li ber çav bigrin, dibe ku dîtînen Marks di hin waran de kêman şaş derkevin, hin tişt jî hene ku qet behsa wan nekiriye. Ev jî bo Marks ne kêmasiyek e. Dide xwiyakirin ku Marks ne pêxember lê alimek e û serokekî şoreşger e. Ji bo Lenîn jî em dikarin her vê yekê bibêjin.

**Pirs:** Tê behskirin ku, paraleliyek di navbera perestroyka û glasnostê de tune ye, perestroyka li pey dimîne di vê rewşê de xeteriya liberalbûna sistemê heye. Meselên ku vê dawiyê li we-

latên Baltîk çê bûn, dibin sedemê şirovekirinên cihê.

**Bersiv:** Di peyva xwe de gava ez li ser perestroyka û glasnostê sekinim, zêdetir ez li ser rola wê ya cihanî sekinim, min xwest bêjim ka gelo m'ena wê jî bo tevgera komunîst a cihanî û jî bo mirovatiyê çiyê. Tiştê ku tu dibêji, girêdayî ye bi pratîka Yekîtiya Sovyetan.

Gava perestroyka û glasnost bi hev re, wek hev nemeşin, helbet dibe ku hin xeterî derkevin. Lê gelo wiha ye yan na? Helbet tiştên ku di vî warî de tînin gotin divê em guh bidinê. Lê divê mewqîfê me jî berê cihêtir be. Berê şaşîtiyek li nik me hebû Partiya Komunîst a Yekîtiya Sovye-

**Gava perestroyka û glasnost bi hev re, wek hev nemeşin, helbet dibe ku hin xeterî derkevin. Lê gelo wiha ye yan na? Helbet tiştên ku di vî warî de tînin gotin divê em guh bidinê. Lê divê mewqîfê me jî berê cihêtir be. Berê şaşîtiyek li nik me hebû Partiya Komunîst a Yekîtiya Sovyetan jî bo welatê xwe ya jî ji bo wezîfê û perspektîfên xwe yên warê netewî û navnetewî çî bigota me digo ew rast e û ma xwe pê ve dizeliqand.**

tan jî bo welatê xwe ya jî jî bo wezîfê û perspektîfên xwe yên warê netewî û navnetewî çî bigota me digo ew rast e û me xwe pê ve dizeliqand. Ev kurmek bû ku jî nihêrtina dogmatîkkirina Marksîzmê dihat, em hin bûbûn tim jî xwe re li Kabekê digeriyan. Divê ev bê terk kirin.

Ku em bi mewqîfê ilmî nêzî meselê bibin, berî her tiştî li ser peyven ku di derheq buyerên YS tînin gotin divê em bi ihtiyat bin. Perestroyka û glasnost çawa dimeşin, yek jî yekê pêşdetir e yan na, ev yek jî me ve qasî ku ew dibêjin xuyaye. Her aliyek tiştêkî dibêje, kîjan çiqas rast e, em nizanin. em ne mecbûrin a yekî qebûl jî bikin.

Helbet ku newekhevî di navbera perestroyka û glasnostê de hebe (ku xuyaye perestroyka gelek dereng dimeşe) xeterî jî bo demokrasîya sosyalîst hene. Lê ev nelihevî çiqas e, dereca wê çiyê em nizanin.

Jê pêştir, qonaxek nuh dest pê kiriye, guhertinên esasî çêdibin. Helbet divê em nefikirin ku hertişt di

riya xwe de, wek hatî planîkirin bimeşe. Yên ku dest bi perestroyka û glasnostê kirin jî miheqeq wê şaşîtiyan bikin, di hin waran de wê bi paş ve bimînin, di hin waran de jî wê ecele bikin. Lê ev tevger jî potansiyela sosyalîzma 70 salan hatiye der. Ne tiştêkî derwayî sosyalîzmê ye. Qeweta xwe ji dinamîzma sosyalîzmê digre û di demên pêşde jî wê çiyê xwe bigire.

A din, ev tevger li flan an bêvan welatî bi ser nekeve jî, ronahîyê û ronahîbûna sosyalîst a ku perestroyka û glasnostê destpêkiriye nasekine, îmkana sekinandina wê nemaye.

**Pirs:** Tu hêviyek we heye ku ev qonaxa nuh tesirê li ser politîka derva ya Yekîtiya Sovyetan bike. Mew-

girêk û dijayetiyan tîkilhev ên nav wê, wek mefulê (objeya) dinya îro tî nihêrtin. Hin tehlîlên navnetewî tînin kirin ku vê encamê dîdin. Peyva ku dibê Ewrûpa mala me ya muşterek e, vê îma dike.

Helbet gava bi çavê mefulê li dinya sisiya bê nihêrtin wê ev nikaribe pirsên cihana me ya îroyîn yên global hel bike û hetta kare welatên sosyalîst û partiyên komunîst li hember sistema sermiyandariya emperyalîst jî dinya sisiyan tecrid bike, tenê bihêle.

Ji vê pêştir, bi tevayî yên tevgera perestroykayê bi rêxistin, gava dixwazin sosyalîzmê bikin merkeza cazîbê, ev muhaweleya tek û tenya ye ku wê deriyê xelasiyê jî bo pêşerojê veke. Em bifikirin carekê: Gava di dema Marks de dihat gotin ku sosyalîzm rîya xelasiya insan e, di wê demê de sosyalîzma reel tunebû û di şerê li hember kapitalîzmê de, karkiran zûtir berê xwe didan sosyalîzmê. Gava bihata gotin yan nivisandin ku ew jî kapitalîzmê xelas bibin wê jî kedxwiriye xelas bibin, bigihîjin jiyanek nuh, gotin û nivisandin bes bûn ku meriv, bawerîya wan pê bîne. Lê îro welatên sosyalîst hene, sistema sosyalîst a cihanî heye, 70 salên jiyanê sosyalîzma reel hene.

Îro êdî pesndayina sosyalîzmê di kitêban de tîrê nake ku meriv berê karkirên welatên sermiyandar, xebatkarên wan û xelkên welatên paşdemayî bide sosyalîzmê. Karkir û xebatkar jî bilî kitêban, carekê jî li welatên sosyalîst dinêrin. Ger li Yekîtiya Sovyetan û li welatên sosyalîst ên din jiyanê insan jî yên welatên sermiyandar yan yên paşdemayî ne pêşdetir be kedkar berê xwe nadin sosyalîzmê.

Em werin ser mesela Helepçê. Gava êrişên kîmyayî hatin ser Helepçê û ser herêmên Behdînan û Kurd jî welatê xwe hatin sirgûnkirin, berî her tiştî Yekîtiya Sovyet û welatên sosyalîst dengê xwe nekirin. Bi min ev ne netîca siyaseta glasnostê ye, lê dide xwiyakirin ku glasnostê hev negihîştîye van waran. Ev dewama siyaseta kevne.



# Çirok

Berbang a sibê bû. Min bi sê şahidan re ciyê xwe girtibû. Gava min dijminê xwe dipa ji bê sebriyê dilê min dihat ber devê min. Roja buharê hilatibû, hewê dest bi germbûnê kiribû jî. Ji dîr ve xuya kir. Uniforma xwe li xwe kiribû, şûrê xwe girê dabû, şahidekî tenê pê re, bi meş dihat. Me xwe nêzî wî kir. Ew jî ber bi me ve hat. Şewqê xwe yê ku di destê xwe de digirt tije giryaz kiribû, zû zû davêt devê xwe. Şahidan donzde gav pîvan û em ji hev qetandin. Diviyabû ku berdana pêşîn min bikira. Lê belê hewqasî bi hêrs bûm ku ji lerizandina destê xwe tirsiyam, ji bo ku xwînsariya xwe wenda nekim û wextê qezenc bikim min xwest ku vî heqî ji wî re bihêlim. Dijminê min ev qebûl nekir. Me biryara peşkê da. Şans cardin bi dildarê xwe yê hertim re kenîya bû, peşk li wî ketibû. Nîşan girt, atêş kir û şewqê min qul kir. Dor hatibû min. Êdî jiyana wî di destê min de bû.

Min bi hemû dîqeta xwe li ruyê wî dinêrî, min dixwest ku qet nebe nîşaneke tertilandinê li wir bigrim. Ew li hember dabança min, bêyî ku xwe tevvide sekinibû, ji şewqê xwe giryazên bûyî dineqand û davê, devê xxwe, dendikên ku tû dikir, difiriyên digihîştin hinda min. Vê bêxemiye mejuyê min çelqandibû. Ez ji xwe re fikirîm, merivekî ku ew bi xwe qîmetê nede jiyana xwe wê çî feyde di kuştina wî de hebe. Di aqilê min de fikreke sakîn wek burûskêkê lîxist. Min lûla dabança xwe serberjêr kir û got:

-Xuya ye ku paxafa te ji mirinê tune ye. Fermo xurîniya xwe bike. Ez naxwazim bibim maniê te.

Bersîva min da, got:  
-Tu maniya te ji min re tune ye. Kerem ke, ez berdana te dipê. Lê belê cardin jî hertim tu xwediyê mafê xwe yê berdanê yî, kîjan ku wexta te xwest, ez di emrê te da me.

Ez vegeyriyam ser şahidan, min diyar kir ku nuha nêta min a berdanê tune ye. Duello bi vî hawî qediya. Min îstîfa xwe da û hatim li vî navçê bi cî bûm. Ji wê rojê û vir de ye bêyî hefhilanîne tu fikreke din bi min re çenebûye. A vaye ew seeta hefhilanîne hat.

Silvîo, mektûba ku vê sê jê re hatibû ji bêrfîka xwe derxist, ji bo xwendinê dirêjî min kir. Yekî ji Moskowayê, (qey wê peyê wî yê ku li kar û barê wî mêze dike be) digot, ew merivê tê zanîn, piştî demekî kin bi xatûnek ciwan û xweşik re mara xwe dibire.

Silvîo got:  
- Ew merivê tê zanîn te yê texmîn kiribe ku kî ye. Ez diçim Moskowayê. Ezê mêze kim ewê ku wextekê giryaxwarinê re mirin dipa berî daweta xwe jî wê karibe bi wê bêxemiye mirinê bipê?

Viya got û rabû pê, şewqê, xwe li erdê xist, wek pilingê di qefesê de oda xwe pê kir. Bêyî ku kirînekê derxim min lê guhdarî dikir, di bin tesîra hisên hevdu negirtî, ne wek hev de ditertîm.

Di vî navberê de xulam ket hundir, got, hesp hazir in. Silvîo bi heraret destê min guvaşt, em çûn lep û ruyên hev. Ereba ku berê bawulek tije debançe û bawulek jî tije tişt, tê de hatibûn bicikirin, ew jî çû lê siwar bû. Carreke din me xatir ji hev xwest,

erebê hereket kir.

Di navberê re çend sal derbas bûbûn. Ji ber hîn sebebên ailewî ez mecbûr mabûm ku li gundekî feqîr ê qeza N\*\*\* bi cî bibim. Ji aliyekî ve bi karê çiftligê mijûl dibûm, ji aliyê din ve jî li wê jiyana bi teq û req, bêxem ku min wextekê derbas kiribû difikirîm û min bêdengî bi îskîni dikişand. Ya herî xerab jî tik û tenê mecbûriya derbaskirina rojên payiz û zivistanan bûn. Bi muxtêr re min gewezetî dikir, xwe bi tiştmiştan dibiland, hetanî êvaran li avahiyên nuh digeriya, bi hawakî min ji xwe re wext derbas dikir, lê gava dinya tarî dibû di rewşeke wisa de bûm ku minê çer bikira, çer nekira min nizanibû. Çend kitêbên ku min ji bin dolaban û ji mexzenê derxistibûn çî bigre hema min giş ji ber kiribûn. Ji çirokên Kîrîlovna Sermezzen ku xeyal meyal di bîr dianî û digot, êdî aciz bûbûm. Sitranên ku pîrekên gundî distiran jî bêyî ku hundir li min reş bikin bi kêrî tu îşî nedihat. Heger ku serê min neçêşanda bi temamî min karibû xwe bida vexwarinê. Dûre îtraf dikim ku, ji ber bîntengiyê muptelatiya vexwarinê, yanî ez tirsiyam ku ezê bibim yek ji wan tîpên herî bînteng ku li qeza me pîr tîpên dîtin, bibim serxweşekî li derhan û derkevim Bêyî çend kesên bînteng ku bi piranî axaftinên wan qirpik û mizmizî bûn tu cîranekî min ê nêz jî tunebû. Di dêlî ku bi wan re bim, tenêbûn hîn çêtir bû.

Çar verst ji çifliga min wê de malîkxanak mezin hebû. Ev malîkxane ya Kontes B\*\*\* bû. Lê belê ne ew, keyayê wê li wir dima. Kontes, di sala pêşîn a zewaca xwe de hatiye, here were mehekê maye. Ez, gava tikûtenê di buhara duduyan a jiyana xwe de bûm, xebera ku wê Kontes û mîrê xwe ha-vînê li gund derbas kin hat. Bi rastî jî di destpêka Hezîranê de derketin hatin.

Hatina cîranekî dewlemend ji bo kesên li gund dijîn bûyereke mezin e. Xwediyên çiftligê û peyayên wan berî bûyerê bi du meha dest bi axaftinê dikin û ev axaftin heta sê sal jî di ser bûyerê re derbas bin, dom dike û dihere. İcar ez bi xwe, ez çî derewan bikim, piştî ku min hatina cîrana xwe ya cîwan û xweşik bihîst êdî ji heycanê dilê min dihat ber devê min. Bi daxwaza gavekê berî gavekê wê bibînim dişewitîm. A ji ber vî yekê, di hefta hatina wan a pêşîn de, rojekê yekşemiyê, piştî xwarinê, wek cîranekî wan ê herî nêz û qûlekî wan ê sadiq jî bo xwe ku teqdimî qatê wan ê bilind bikim, min riya gundê \*\*\* girt.

Xizmetkar ez girtim oda Kont a xebatê, çû xebera hatina min bide. Ev, odayek fireh û muhteşem bû. Li ser dîwaran, refên kitêban ku bust li ser wan hebûn hatibûn bicikirin. Li ser şomîna mermer neynikek mezin hebû. Ser textên erdê bi çuxê kesk hatibû girtin, li ser wan jî xalî hatibûn raxistin. Feqîriya min, luks bi min dabû jibîrkirin. Ya din jî ji ber ku ji mîjve bû ji dewlemendiyên xerîb re girtî bûm ez cefilîm, recaciyeke jî der çawa ku bi gupegupa dil wezîr dipê, min jî her bi wî şiklî Kont pa. Piştî bîstikekê ji derî, merivekî çeleng ê sî û du salî ket hundir. Bi awirekî şîrîn û dostanî

# Nîşan

-II-

A. S. Pûşkîn  
Wergêr: Z. Xamo

nêzîkayî nîşan da. Hîn min xwe topî ser hev dikir ku xwe bidim naskirin wî zûtir hereket kir. Em rûniştin, sohbeta Kont a serbest û zîrek cefilandina min biribû. Tam cefilandina min çûbû, min xwe dabû ser hev, İcar jî Kontes ket hundir, bi hatina Kontesê re ji nuh ve helak bûm. Bi rastî jî jî-neke gelek xweşik bû. Kont em bi hev dan naskirin. Min dixwest ez sakin bêm xuyakirin. Lê belê her ku min dixwest rewşeke bêtasûwas, bêxemiye bidim xwe, hewqasî jî dest û lingên min li hev dipiçikîn. Kont û Kontesê ji bo ku ez xwe rehet hîs bikim, fêrî vî naskirina nuh bibim yanî bi wê fikra ku ez wextê qezenc bikim wek ku li ba dostekî xwe bim di nav xwe de dest bi axaftinê kirin. Min jî di vî rabûnê de dest pê kir di odê de çûm û hatim min tablo, kitêb jî çav derbas kirin. Ji rîsma fêm nakim, lê belê ji tabloyan yekê bala min kişand. Ev, manzareyeke îswîçrê bû. Lê tiştê ku tesîr li min kir ne manzara bi xwe bû, di tabloyê de hebûna du qulikên li ser hev suyarbûyî yên derbên dabancê bûn. Vegeyriyam ser Kont. Min got:

-Derbeke yeman e.  
-Bersîv da, got:  
-Erê. Avêtinek fewqelade ye. Ma nîşancîtiya te baş e gelo?  
Ji ber ku peyv hat ser meseleyeke ku min aleqedar dike pê kêfxweş bûm.

Min got:  
-Heta tu bixwazî. Ji sî gav dîrayiyê dikarim li kaxeteke îskambîlê xim. Lê heger ku bi dabançeyê ku ez fêrî wê bim berdim. Kontesê bi ala qeyê mezin got:

-Rast? Ya tu dosto, tu jî dikarî ji sî gavî li kaxeteke îskambîlê xî?

Kont got:  
-Ezê rojekê biceribînim. Di wexta xwe da ne nîşanciyekî xerab bûm. Lê ev çar sal in ku dabançe bi destê min nebûye.

Min got:  
-Hoo hoo wê çaxê ez dikarim bi te re şert bigrim ku tu yê ji bîst gavî jî nikaribî îsabet bikî begê min. Ev karekî fêrbûnê ye. Ez ji nîşanciyên herî baş ên alaya me dihatim hesibandin, Demekê jî ber ku min dabança xwe dabû çêkirinê tam mehekê silêh bi destê min nebû. Begê min, tu bawer dikî, piştî vî mehê di nîşana min a ewil de li ser hev tam min çar caran li şuşeyek bîst û pênc mîtroiyî dîr nexist. Di alaya me de yuzbaşiyekî henekçiyê hazircewab hebû. Got, bira, qey destê te li şuşê nagere. Na begê min, heger tu tim li ser hev îdmanê nekî tuyê hostatiya xwe wenda bikî. Di hemû jiyana xwe de ew nîşanciyê ku ez pîrî baş nas dikim her roj berî xwarinê 3 derb diavêt. Ev, ji bo wî tiştêkî wek fêrbûna vexwarina qedehek votka bû.

Ev tevêbûna min a axaftinê xwediyên malê jî kêfxweş kiribûn.

Kont pîrsî, got:  
-Baş e ew nîşanciyekî çawa bû?  
-Mêze kin, çawa bû begê min. Em bibêjin ku mîşekê li diwêr venîşt û wî jî ew dît; Kontes tu dikenî, lê bawer bikê ez rastiye dibêjim. Belê, em bibêjin ku mîşekê li diwêr venîşt û wî jî ew dît: Wê biqîre, ji xizmetkarê xwe re bibêje: "Kûzka, dabança min bîne." Kûzka wê dabança dagirtî bîne, ewî jî bi yek derbê ve wê mîşê bi diwêr ve bizeliqîne.

Kont got:  
-Tiştêkî xerîb e. Baş e navê wî çî bû?

-Silvîo bû, begê min.  
Kont ji ciyê xwe hol bû, bi qîrîn got:

-Silvîo! Tu Silvîo nas dikî?  
-Ezê çawa nas nekim begê min, ew dostê min bû. Di alayê de me gişan wek birayê xwe jê hez dikir. Lê ev pênc sal in ku min xeber jê negirtiye. Wê çaxê waye hûn jî wî nas dikin begê min?

-Min nas dikir, him jî pîrî ji nêz ve nas dikir. Ezê ji te re tiştêkî hatiye serê min lê belê, ez bawer nakim, na. Ji we re qala bûyereke pîrî e'cêb ku hatibû serê wî qet nekir?

-Ëv, di baloyekê de ji donjuanekî xwarina silleyekê nebe begê min?

-Navê wî donjuanî jî gotibû?  
-Na, negot begê min.

Min bi carekê de rastî texmîn kiribû. Min got:  
-Feqet, bisekinin, efû bikin... Min nizanibû... Nebe ku hûn bin?

Kont bi hawakî pîrî bê kêf got:  
-Ez bûm. Ev tabloya ku qulikên gullan lê hene jî yadîgara hevdiîna me ya dawiyî ye.

Kontesê got:  
-Ax, ruhê min, çî dibe, qe qala vîya meke. Naxwazim bibihîzim jî.

Kont got:  
-Na ezê her tiştî bibêjim. Min çawa heqaret li dostê wî kiriye dizane. Bira bizanibe Silvîo heyf jî çawa girtiye.

Kursiya xwe bi alî min de anî, ev çîroka ku min bi ruh û can lê guhdarî kir ji min re got:

"Pênc sal berê zewicim. Meha ewil a zewaca xwe, **The honey moon**'a6 xwe me li vir, li vî gundî buhurand. Deqîqeyên jiyana xwe yên herî baş û gavên jiyana xwe yên herî xerab jî cardin ez di vî xanî de jiyam. Danê êvarekê bi pîreka xwe re bi hespan derketibûm gerekê. Serhişkiya hespa wê girt. Pîreka min tirsîya û rişma wê destkêşî min kir, wê, bi peyatî berî da malê. Ez berî wê gihîştim mal. Li hewşê erebak rêwiyekî sekinibû. Ji min re gotin, merivekî ku navê xwe negotiye, bes gotiye ku bi min re îşê wî heye, li oda min a xebatê min dipê. Ez ketim odê, di tariyê de min peyakî ku riya wî dirêj bûye, di nav toz û tebarê de dît. Tam li vir, li hinda şomîne sekinibû. Bi wê daxwaza ku ez wî ruyî nas bikim ez nêz bûmê. Xerîb bi den-

gekî qalin got:  
-Qey te ez nas nekirim Kont?  
Bi qîrîn, min got:  
-Silvîo! Û ez çî derewê bikim min wer hîs kir ku porê min bi carê de pîj pîjî bûye.

Wî got:  
-Eynî ew bi xwe ye. Dora berdanê ya min bû. Ez hatim dabança xwe vala bikim. Tu hazir î?

Dabança wî ji bêriya wî ya kêlekê li ba dibû. Min donzde gav jimartin û sekinim, berî ku jina min bê, min jê daxwaz kir ku gavekê berî gavekê berde. Lê wî destê xwe giran digirt. Ronahî xwest. Mûm anîn. Min derî girt, Ji bo ku kesek nekeve hundur, min emir da, carek din min jê xwest ku atêş bike. Dabança xwe derxist, nîşan girt... Min saniye dijmartin, li jina xwe difikirîm... Ji bo min deqîqeyek ku qet bi gotin nayê derbas bû. Silvîo piyê xwe bera jê da û got:

-Ji bo ku dabança min bi dendi-kên giryazan ne dagirtiye ez xemgîn im. Gulle giran e. Ev îş jî duelloyê bêtir bi min wek cînyetekê tê. Ez fêrî atêşkirina merivekî bê silêh nebûm. Divê em ji nuh ve destpêbikin. Ji bo berdana pêşî emê pişkê bavêjin.

Serê min gêj dibû... Ez dibêmin qebûl nedikir... Lê belê dûre, me dabançeyek din dagirt. Ji bo avêtina pişkê me du kaxet lûr kirin. Herdu kaxet jî xist wî şewqê xwe yê ku wextekê bi gulla min berdayê qul bûbû. Pişk cardin li min ket. Bi kenekî bi tinazê ku ezê qet ji bîr nekim got:

-Tu wek şeytanekî bi şans î Kont.

Çawa bû, ev yek çawa bi min da kirin nizanîm lê, min berdayê û gullê a ev tabloya qul kir.

Kont tabloya qulika gullê lê hebû bi tiliya xwe nîşan dida. (Ruyê wî pêrî pêrî dişewitî) Benzê Kontesê, ji dismala ku di dest xwe de digirt sipîtir bûbû. Min bi xwe nikaribû rê li ber qîrîneka ku ji gewriya min derket bigirta.

Kont axaftina xwe domand, got:

-Min berdayê û gelek şukur ku min hedef negirt. Wê çaxê Silvîo (wê gavê bi rastî muthîş bû) nîşan girt. Bi carê de derî vebû, Maşa bi bazdan ket hundir, got haho û xwe avêt ji hustiyê min de. Bi hatina wê re xwînsariya min cardin hatibû min. Min got:

-Delala min, ma tu nabînî em henekan dikin? Çima tu ditirsî? Here tasek av vexwe û were ku ez dostê xwe yê kevn bi te bidim nas kirin.

Min bi Maşa nedabû bawerkirin. Vegeyriya ser Silvîo jê pîrsî, got:

-Ma mîrê min rast dibêje? Ma bi rastî hûn henekan dikin?

Silvîo got:  
-Ew hertim henekan dike Kontes. Carê bi henekî ev şewqê min ê ku tu dibînî bi mermiyê qul ki-



## ne karê aqila ye lê rast e

### Amadekar: Hesên Mizgîn

❖Zarokê/a di rehma jina ku cara yekemîn bi hemle dibe, di hefta 20'emîn de dest bi hereketê dike. Lê jina ku cara duemîn bi hemle dikeve, zarok di rehma wê de, di hefta 18'emîn de dest bi hereketê dike.

Anîna zarokê ji bo jina ku cara yekemîn zarok tîne 18 seet dikşîne û ji bo jina ku cara duemîn zarok tîne 12 seet dikşîne.

❖Jinên bi hemle (bi zarok-ducana) %20 zêdetir oksîjen digre. Ji ber vê yekê ji plasma xwînê jî zêde dibe.

❖Zarok wek adetî 20 diranên şîr derdixin. Diranên pêşin dema zarok dikeve şeş(6) mehiya xwe derdikevin. Yê din jî di nav 20 mehan de derdikevin.

❖Li dinyayê her sal ji nexweşîna rodiyan (rêviyan, roviyan) 5 milyon in-

san dimrin. Ew tê wê manê ku di deqêkê de 10 insan dimrin.

❖Lêkolînerên Fransîzî boyaxek dîtî-nê ku bi vê boyaxê kesên bi nexweşîna astma(astim) baş dibin. Lêkolîneran bi vê boyaxê odek boyax kirine. Kesê nexweş dikeve wê odeyê û pişt re jî baş dibe.

❖Li dinyayê insanên herî kin li Kongoyê dijîn. Ji wan re pîgmî tê gotin û bejna wan 1,35 dirêj e. Dîsa li dinê insanên herî dirêj jî li Kongoyê dijîn û cînarê pîgmîya ne û bejna wan 2.10 dirêj e.

❖Li dinyayê nêzî 3000 kermêşên (pêşuyên) curbecur hene. Ji bo van kermêşan tenê tiştêk muştêrek e. Tenê kermêşên mê pê vedidin. Kermêşên nêr pê venadin û bi ava gul û çiçekan dijîn.

❖Masiyên ku li dorhêla Arktîs û Antarktîs dijîn, di xwîna wan de glîkoprotein heye. Glîkoprotein nahêle ku xwîna wan masiyan biqerise.

❖Wek tê zanîn quling teyrekî koçer e. Tewrek jî qulingan ku nikulsor e, di dema koça xwe de -bihar û payîzê- 40.000 km difire.

Destpêk r. 1

## Li Sêrtê û Hekariyê provakasyonên dewletê

Li gor teblihatê diviya gundî 2.5 km. ji gund bi dûr nekevin. Xwedêgiravî manawrayên eskerî hene, gava gundiyek derkeve derwayî vî hudûdî wê bi gulên leşkeran bê kuştin. Ev biryar dihat wê manê ku gundî wê nikaribin dewarê xwe biçêrin, zeviyên xwe rakin, gêlê bikin, derkevin nav daristanên xwe, jî bo zivistanê giya biçinin.

Wê çaxê wê gundî çawa bikin? Mecbûr bimînin ji gundên xwe derkevin koçî bajarên bikin. Ji xwe dewletê van gundan bi tesadufî hilnebijartibû. Xelkên van gundan welatparêz in. Çekên dewletê qebûl nekirin û nexwestin bibin milîsên wan û wek dewlet wan bi nav dike, tu têkiliyê van gundiyan bi PKK re jî tune.

### Him kuştin û him jî şewitandin

Li herêma Beytuşebabê, li gundê Yoncaliyê leşkerên Tirk du gundî kuştin, keçek piçûk jî birîndar kirin. Dewletê beyan kir ku ev kesên han "teorîst" bûn û bi leşkeran re ketine şer, di şer de hatine kuştin. Dûre derket, wek ku gelek bûyerên din ev jî derew bû. Herçiqas muxtarê gund ew îqaz kirine jî lê leşkerên Tirk cardin jî gule bera du gundiyan ku li dora gund giya diçin dane. Yekî di cî de dikujin, yê din jî digrin bi lêdanê dikujin. Piştî ku wan dikujin, jî bo ku sûcê wan dernekeve, radi-bînan cesedên wan dişewitînin.

Dîsa nêzî Mêrdîne di tariya şevê de hin kes gulan

bera minibusêke sivil didin, yekî dikujin. Berpirsaryên dewletê yê herêmê dîsa dan diyarkirin ku "teorîsta" ev curm kiriye. Lê li gor şahidiya rêviyan ew kesên ku gule bera minibusê dane leşker bi xwe bûn.

Dewleta kolonyalist bi van kirinên xwe jî namîne, jî bo ku qetliamên hin mezin bikin, biryarên nuh distînin. Hin amirhêzên leşkerî, vekirî xelkên herêmê bi çekên kimyayî tehdîd dikin. Li gor nûçeyên ji herêmê tenê cî bi cî, di çapek piçûk de be jî çekên kimyayî bi kar anîne.

### Terora dewletê bêtarîf e

Tesîra êrişên dewletê xwe nîşan didê. Bi hezaran gundî dev ji gundê xwe berdidin, berê xwe didin bajarên mezin. Ji vana qismekî mezin koçî Tirkîyê dikin. Di dest de tu îstatîstîk tune, lê bi rehetî di nav van sê-çar salên dawiyê de nêzî nîv milyon kes jî herêma Mêrdîne, Sêrtê, Wanê û Hekariyê koç kirine.

Ev terora dewletê ya bêtarîf ku li dijberî muxalefêtek radikal diafirîne cardin jî gundiyan êdî wek berê natîrsîne. Wan di van salên dawiyê de, di jiyana xwe de dîtînan ku tirs alîkariya wan nake, wan jî zulm û terora dewletê xelas nake. Gundî êdî terora dewletê, kiryarên wê yê qirêj deşîfre dikin û digihînin raya giştî. Bûyera Cinêbir di vê merhelê de bû minakek û destpêkek.

Gundî bi vîya jî namînin cî bi cî li ber xwe jî didin. 4-

5 hezar gundiyan Gundik û mezrayên wê dijî kirinên dewletê serî hildan, hemû bi hevra daketin ser riyên mezin, rûniştin, kirinên dewletê protesto kirin. Ev tevgera wan gihîşt raya giştî. Mebûs, serokên partiyên burjuwazî mecbûr man ku guh bidin wan û herin herêmê derd û problemên wan di cî de bibînin.

### Platforma demokratîk

Ev operasyonên dewleta kolonyalist, nefreta pêşevrû û welatparêzan û xelkê Kurd dikşîne ser xwe. Li Diyarbekir gelek hêz û kesên şoreşger û welatparêz li dijî van kirinên dewletê bi navê Platforma Demokratîk-Diyarbekir yekîtiyek ava kirin. Platform di beyana xwe de piştî ku qala bûyerên wê dawiyê dike, weha dibêje: "Wek berê iro jî xelkê Kurd li dijî qetliam, kirinên ne insanî û zulma ku li wan dibe, derdikeve. Gelê Kurd jî bo ku şerefa xwe biparêze, wê dawiyê bi berxwedana bûyera Cinêbirê û bi tevgera Gundik serî hilda. Van bûyerên dawî dide nîşandan ku gelê me tadeya lê dibe qebûl nake û vîya bi tevgerên cur be cur dide nîşandan. Em di wê baweriyê da ne ku tevgerên bi vî rengî wê li Kurdistanê fireh bibin û wê gelê me xwedî lê derkeve. Bi taybetî kesên ku jî xwe re dibêjin şoreşger, demokrat, welatparêz, sosyalîst û komunist herkes, bi riyeke vekirî divê li dijî van leystikan tewrê xwe deynin û vatîniyên ku dikevin ser milên wan bi cî binin. Ger ev neyê kirin bedêla kerrbûn û benden-

## Hindik-Rindik

### Kartol û heval

Li Bulgarîstanê, komsereki siyasi, ji komsêrê gelê bajarê Rûsê li ser mahsûla kartolan raporek xwestibû. Mêrikê gundî dest pê kir:

"Bi saya serkeftina hukumeta me, me îsal rekoltayek (mahsûlek) pîrr baş ji kartolan girt. Kartolên me top kirin ku yek bi yek bidana ser hev, wê çiyakî hewqas bilind ku kariba bigihîsta nigên Xwedê jê bihata meydanê."

Li ser vê minaka mêrikê gundî, komsêr qehêrî got: "Xêvo, ew çî gotin e? Ma Xwedê heye, ku çiya jî here bigihîje nigên wî?"

Mêrikê gundî demeke kurt şaş ma, nîzanîbû ku wê bibêje çî? Lê dûre lê vegevand, got:

"Bibûre, welle tu rast dibêji hevalê komsêr, lê ji xwe hewqas kartol jî tune ne."

### Ji êşa m'ade re melhema çawa

Yekî Kazwînî diçe ser doktor, dibêje ma'dê min diêşe.

Doktor jê dipirse:

"Te vê sibê û danê nivro çî xwar?"

"Doktor beg, welle hema li malê çî dan ber min, min jî ew xwar."

Li ser vê bersîva mêrik, doktor jî radibe melhemê dîde ber çavê wî.

Mêrikê nexweş bi hawakî şaşmayî dibêje:

"Doktor efendi, ez jî te re dibêjim ma'dê min diêşe, tu melhemê diki çavê min... Ma çî têkiliya mad û çavên min bi hev heye?"

Doktor:

"Çawa tune? Heger çavê te saxlem ba, her jahr û zuqûma hat ber te, te nedixwar û ma'dê xwe jî pê xera nedikir."

### Poşmanî

Hevalên Sokrates jê pirsine, gotine:

"Bi ya te, divê meriv bizewice, ya azîb bimîne?"

Sokrates li wan vegerandiye:

"Dixwazin bizewicin, dixwazin azîb bimînin; çawa be hûnê poşman bibin."

Amadekar: Zînarê Xamo

giyê wê giran be".

TEVGERê jî li ser van bûyerên dawî belavokek belav kir. Ew di belavokê de qala bûyerên wê dawiyê, operasyon û armancên dewleta kolonyalist dike û bangî gelê Kurd dike:

"Gelê Kurdistanê cefakêş!

Welatparêzno, ronakbîrno, gelî herkesê xwedînamûs!

Welat û gelê me carek din li hemberî xeteriyek mezin e. Hêzên kolonyalist ên ku bi terora salan bi xwinrîtinê, bi îşkencê û bi hezaran karên bêşerefî nikarîbûne bigihîjin armancên xwe û di ser re jî pêrgiyî kîn û nefreta gelê me bûne, bi hêrs û harbûna wê yekê iro hê jî êrişkartin bûne. Ketine hewesa sirgûn û qir-kirinek din.

Divê em rê li wê bigrin, em karin bigrin. Divê em nî-

şanî dost û dijmin jî bidin ku hêza geleki hişyar û têkoşer jî ya zordaran pirtir e.

Ji bo wê yekê, berî her tiştî me yekîtiyek hêzên milî divê.

Di demên berê de ya ku êrişên dijmin hêsatir dikir, berî her tistî perçebûna hêzên gel, belavbûna wan bû. Dijminê kolonyalist jî ferqên eşîrî û mezhebî, jî bîrêxistinî û kêzananîna xelkê fêde girt. Divê em careke din wê firsendê nedin wî.

Diroke gelek caran nîşan da ku, mezintirîn hêz hêza cemahîran (girseyan) e ku bi xwe bawer e û derdikeve têkoşinê. Ev bitesirtirîne hemû silehan e. Yê ku plan û provakasyonên dijmin yê xain pûç bike jî di esasi de ev hêz e".

□

### Cinayetên rejîma Îranê dom dike

Roja 26'ê Tebaxê endamê Komîta Merkezi ya Partiya Komünist a Îranê Behman Cewadî li Kîbrîsê hat kuştin. B. Cewadî yek jî kadîrên naskirî yê Partiya Komünistê Îranê bû.

Her wiha di roja 3'ê Îlonê de yek jî serekên Komela Sadiq Kemanger li Kurdistanê Iraqê nêzî sinorê Kurdistanê Îranê hat kuştin.

Li gor agahdariyan her du cinayet jî ji alî rejîma Îranê ve hatiye çekirin.



# XENCERÊ PEPOY

Y. PEYE

Yewo ki şiyû heywanan ver, zanû, yaban a yew vaş estû ki xencerî manenû. Tî ra vacênû "xencerê pepoy". İno vaş nêwerênû. Ez vana qey heywanî zî jey nêwenî.

Ez vana qery ma hetî yanî dewanê Gêlî<sup>1</sup> di ayo ki mesela Pepo'y û Xeci<sup>2</sup> nêzanû, çinû. Vanî yew wext yew bira û yew way bî. Namey biray Pepo, ey way zî Xeci biyo. Yew rocê wesarî Pepo û Xeci şonî yaban ki kenger bigeyrî.

Şonî kenger. Tewrewo ki kenger dekenî Xeci di wo. Nîmaj ra heta êrey kenger çinenî. Serê şanî Pepo warda xwi ra persenû, vanû:

-İnka Xecê, bes niyû? Hela beri (biyarî) vey (veyna) ma çindî çinawû.

Xeci tewrî ana Pepoy nawnena. Ewnênî ki çi bewnî! Di-hîrê hebî qotê kengerî ha miyan di. Pepo vanû:

-Qey to tipê kengerî werdû Xecê?

Xeci vana:

-Willay billey ney! Tewbe bû ki mi yew hebi werdû!

O vanû:

-Neey, tipê jey to werdû!

Daşt-naşt, Pepo hêrs benû û xencerê xwi ancenû, danû Xeci rû. Xeci a gamî ewra gan dena.

Wexto ki Xeci merena, ti ra pey Pepo hewnênû ki çi b'ewniyû! Binê tewrî qul û. Pepo indî ki qarêno, indî ki warda xwi ver kwenû, vanû:

-Ella Ella, ti mi yew teyr bikî, yaban finî!

A gamî Pepo benû yew teyr û yaban kwenû.

Ay roc-ino roc o, geyrenû û namey warda xwi vanû, vanû:

-Xecê, Xecê!

Vanî wexto ki o ina hewa vanû, Xeci zî cewab dena bere.

Ay kengero ki tewre ra kewto zî biyo vaşo ki ti ra vacênû "xencerê pepoy".

## ÊMO<sup>1</sup>

Hele Êmo, Êmo, Êmay mi;  
La Êmo, Êmo, Êmay mi.  
Êmo, Êmo, Êmay mi;  
La Êm qewetê keydê mi.

Êmê, rarê Miyerron'î<sup>2</sup> qeyme wo;  
La Êmo, Êmo, Êmay mi.  
Êmê, rarê Miyerron'î qeyme wo;  
La Êm hêviya keydê mi.

Hele Êm dest eşto (eyşto) mi manewo,  
La Êmo, Êmo, Êmay mi.  
Êm dest eşto (eyşto) mi manewo,  
La Êm hêviya keydê mi.

Dayk û bawkê Êmi şî gerrewo,  
La Êmo, Êmo, Êmay mi.  
Dayk û bawkê Êmi şî gerrewo,  
La Êm hêviya keydê mi.

Ez û Êmi ma şî îfadewo,  
La Êmo, Êmo, Êmay mi.  
Ez û Êmi ma şî îfadewo,  
La Êm hêviya keydê mi.

Gerrey dayk û bawkî bêfayde wo,  
La Êmo, Êmo, Êmay mi.  
Gerrey dayk û bawkî bêfayde wo,  
La Êm qewetê keydê mi.

(1) Na deyîri heway vatişê yew Dêreyîjî nusiyaya (Dêrey yew dewa qezayê Pîran'î ya).

(2) Miyerron: Yey nahiyeyê qezayê Pali yo. Dewleta Tirkiye nameyê yê bedilnawo, kerdo Arıcak.

# Deyîrê ma

Arêkerdox: Malmîsanij

## KOYÊ MA'DENÎ<sup>1</sup>

Osman piyê keynan o.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Ju û juwer kay dano.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Juweker mi (ma) nêdano.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi<sup>2</sup>.

Gunadê mi (ma) di bimano.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

'Erdo sûro filhan o.

Way lê lê, way lê lê, rindika mi.

Qaydim<sup>3</sup> jew rihan o.

Way lê lê, way lê lê, rindika mi.

Rihan darîyê biskan o.

Way lê lê, way lê lê, rindika mi.

Binê biskan cayê lewan o.

Way lê lê, way lê lê, rindika mi.

Koyê Ma'denî<sup>4</sup> dûman o

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Dûmanê pîrekan o.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Rindê şina aw ver o.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Derdê rindê mêrde o.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Vaya aryî<sup>5</sup> xorî ya.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Beşna keyna barî ya.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Rindi şina qizwanî<sup>6</sup>.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Dest di morî, mircanî.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Xorî heyranê ê ganî.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way lê lê, rinda mi.

Way lê lê, way



## Ji xwendevanan

### Hevalên delal û hêja yên Redaksiyona Armançê;

Gelek silavên germ yê biratî li we dikim. Hêvîdarim hûn nama min bigrin, kêfxweş bin û serfiraz bin.

Hevalên hêja, iro bê feydeye ku rojnamek ne bi zimanê dayik be; ji ber vê yekê jî min gelek name ji rojname û kovarên Kurdî ku li Ewrûpayê derdikevin re rê kirin. Û min nameyek ji we re jî rê kir. Ew bû du hejmarê rojname we distînim û ji ber vê yekê ez gelek kêfxweşim û spasiya we dikim. Bawerim hûnê tim û tim rojname xwe ya hêja jî min re bişînin, lê hûn baş zanibin ku

perê abonetiya we ez nikarim rê bikim.

Daxwaza min ya din jî hinek meqalên minê piçûk û hinek jî min ji zimanê Rûsî wergerandine Kurdî, ku ez ji we re bişînim hûnê karibin çap bi-

kin?

Di xebata we de pêşketin û serfiraziyê dixwazim.

**Ûsif Mistefa  
Alma Ata  
Kazaxistan**

### Namên Gîhaştî

1-B. Can: Yûgoslaviya, 2-Alî Omer: Yûgoslaviya, 3-Kamiran Hajabdo: Yûgoslaviya 4-Mûsa Rodî: Almanya Federal 5-Pêşmerge Çeto: Goteborg-Swêd 6-Xemgîn Temê: Sofya-Bûlgaria, 7-Delala Memê Recevî: Erîvan-Yekîtiya Sovyet, 8-Gundî: Sofya-Bûlgaria, 9-M. Tugrul: Diyarbekir

## X a ç e p i r s

### Amadekar: S. Rêving

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												
11												
12												

**Çeperast:** 1- a)Paşnavê serokekî Kurd ku di roja 13.7.1989' an de bi bêbextî li bajarê Viyanayê hat kuştin. b)Navê kevin ê Diyarbekirê. 2- a)Di Kurmançî de pronavê îşarkî ji bo tiştên nêzik. b)Lêkera ku ji bo xuyakirina êşê, janê bi kar tê (bi taybetî êşa diranan). 3-a)Cihê ku mirova li ser îdam dikin (berevajî). b)Bi Soranî "ufuq", her weha navê keç û kuran e jî (berevajî). c)Baş, kêrhatî (berevajî). 4-a)Di Kurmançî de pronavê îşarkî ji bo kes û tiştên nêzik

yên nêr. b)Pirsîyarek. 5-a)Peyvek e her tim di pêşîya pirsan de tê. b)Navê cihekî laşê meriv (berevajî). 6-a) Hejmarek (berevajî), b)Rih. c)Di edebiyata Erebi de pîvaneke helbestê. 7-a)Me'deneke biha. b)Li aliyê Botan ji bo "poşman"ê dibêjin. 8-a)Maç. b)Di kîmyayê de îşareta (sembola) "çinko"yê. 9-a)Ne vala. b)Navê darekê, her weha ji bo jina ku mêrê wê miribe an ew berdabe tê gotin. 10-a)Bajarek li Kurdistana Îranê (berevajî). b)Kovara Kurdî a Federasyona Ko-

melên Kurdistan li Swêd. 11-a)Mêweyek, fêkiyek (berevajî). b)Navê tiştên ku li ser piştê mirov yan piştê piştê dewaran tên kişandin. c)Di Kurmançî de paşdaçêkek. 12-a)Kesê ku ji Îranê (berevajî). b)Yekem Pêxember.

**Serejêr:** 1-a)Dîdevan nêrevan, pasewan (bi Tirkî jê re "gözcü" dibêjin). b)Qeş, tik. 2-a) Gund an bajarê ku jiyana lê heye, şênî, ne xopan. b)Sebzeyek ku tansiyona merivan tîne xwarê. c)Ne, no, nexêr. 3-a)Sebeb. b)Wezîfe. 4-a)Demek ji rojê. b)Li Afrîqayê welatek. 5-a)Heywanek ku di avê de dijî. b)Heywanekî biçûk ku sixên (pîj) wê hene (berevajî). c)Peyva teyidkirinê ku bi pronava îşaretê re bi kar tê. 6-a)Sembola perê Tirkîyê. b)Ji navê qîzan(berevajî). 7-a)Bi Zazakî "çiya" (berevajî). b)Erdê tê av, erdê bi av (berevajî). c)Qapûtê dirêj ê ji qumaşê qalind. 8-a)Car din, careke din (berevajî). b)Meydana ku "şerê boxe û mirovan" lê têkirin (berevajî). 9-a)Niha, nûhû, kurtiya "a niha". b)Bi piranî ji ardê genim çêdikin. c)Kurê dê û babê mirovî. 10-a)Kûz, şerbîka ku ji axa sor çêdikin û havînan avê tê de sar dikin. b)Nexweşiyek. 11-a)Belê, e. b)Ne dereng. c)Ne mirî, bi ruh. 12-a)Şiva şer, şiva qalind. b)Dildara Memê Alan. c)Hesinek e û ji bo kontrolê (bi hevsa-rê ve rişim girêdayî) dixin nav lêvên hespan.

### Agahdarî

Nivîs, meqale, helbest û rismên ku nivîskar, helbestvan û xwendevanên me, ji bo çapkirinê ji Redaksiyona me re dişînin -redaksiyon çap bike an jî çapneke- li wan nayê vegerandin.

## Dûmahîka Nûçan

### Hezaran cînayeta Îranê...

rejîma mellan a destbixwîn hat protestokirin, meşvan li baxçê Humlegorden kom bûn. Li vir, li gel axaftinên nûnerên PDK-I, TEVGER û Federasyona Kome-lên Kurdistanê li Swêd, endamê Komîta Piştgiyariya Kurdan li Swêd; rejîsorê Swêdiyê bi nav û deng Gösta Eckman jî peyivî, li ser têkoşîn û jiyana Dr. A. Qasimlo gelek tiştên pesindar got û cînayeta rejîma îranê mahkûm kir. Her wisa hemûyên axaftvanan jî di axaftinên xwe de gotin qatîlê Dr. A. Qasimlo, A. Qadirî û F. Resûl rejîma îranê ye.

Piştî axaftvanan, meşvan çûn ber sefaretxana Awusturya, li ser navê hêzên ku

meş amedekiribûn nameyek protestoyê dan sefaretê Awusturyayê. Di namê de ji hukumeta Awusturya dihat xwestin ku, divê ew vê cînayeta îranê bincil nekin û qetlîamê bi hawakî resmî eşkere bikin.

Wek tê zanîn Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana îranê Dr. Qasimlo, endamê Komîta Merkezî û berpirsiyarê wan ê Ewrûpayê Abdulah Qadirî û ji Kurdistana Iraqê Dr. Fadil Resûl di 13'ê Tirmehê de li paytexta Awusturya li Wiyanayê ji alî qatîlên rejîma îranê ve bi hawakî bêbextî hatibûn şehidkirin. Cenazê Dr. Qasimlo û yê A. Qadirî di 20'ê Tirmehê de bi merasimek gelek me-

zin li Parîsê li Goristana Şehîdên Komuna Parîsê hatin veşartin. Dr. Fadil Resûl jî li Wiyanayê hat gorkirin.

Di cenazê Dr. A. Qasimlo de tiştê bala meriv dikand bes ne Kurdên li Fransayê diman beşdarî cenazê bûbûn, hema hema ji hemû welatên Ewrûpayê bi sedan Kurdên welatperwer hatibûn Parîsê ji bo ku tekevin bin darbesta welatperwerê mezin. Ji Swêd jî 93 Kurdên welatperwer û hin Swêdiyan balafirek kirê kirin û çûn di merasima cenaze de amada bûn, bi vî hawî wezîfa xwe ya dawî bi cih anin.

### Di berxwedanan da du şehîd

Di dawîya meha Hezîranê de di hefsa bajarê Eskişehrê de du tunel hatin dîtin. Li ser vê yekê rejîma Ozal carek din tade, zulm û îşkence li girtî û mahkûman zêde kirin û mafên ku girtiyan bi berxwedanên xwe û bi xwîna xwe standibûn dîsan ji wan paş de hat stendin. Girtî ji bo ku mafên xwe bistînin û zulm û zorê protesto bikin di 29'ê Hezîranê de dest bi grewa birçîbûnê kirin. Di demek kin de grew li hefsên din jî belav bû. Girtiyan hefsa Diyarbekirê, Elazîzê, Meraşê, Entabê, Erxeniyê, Meletyê, Adiyemanê, Erzincanê, Ceyhanê, Amasyayê, Nazîliyê, Edenê, Çaneqelê, Bursa-yê, Muxlayê, Anqerê, Stenbolê û yên din ketin grewê.

Di 32 rojên grewê de girtiyan Eskişehrê bi kotek û bi lêdan naqlî nefsa bajarê Aydinê kirin. Wextê girtî gihîştin hefsa Aydinê, du kesên welatparêz; Huseyîn Husnî Eroxlu û Mehmed Yalçinkaya şehîd ketin. Bi sedan kes ketin qomayê û piraniyan wan felc bûn. Piştî vê bûyarê girtiyan grewa birçîbûnê vegehandin grewa mirinê.

Li ser şehîdbûna du girtiyan welatparêz li her dera

welat û li dervayî welat tevgerên cur be cur hatin çêkirin. Nivîskar, parlamentêr, awuqat, kesên siyasî, rojnamevan, xwendevan, komîte û komelên mafê insanî, kesên pêşverû û şoreşger, dê, bav û merivên girtiyan û hwd bi meş û bi mitîngan, bi grew û pre-skonferansan û bi protestoyên din piştgiyariya girtiyan kirin û ji bo rakirina "Biryarnama l'ê Tebaxê" zor dan hukumeta Ozal.

Li Ewrûpayê jî ji bo piştgiyariya girtiyan hefsan û rûreşkirina rejîma Ozal çalakîyên cur be cur hatin çêkirin. Li Swêdê di 10'ê Tebaxê de grûbek Kurd û Tirk ji Komîta Piştgiyariya Girtiyan Siyasî li Tirkîyê û Kurdistana buroya THY ya Stockholmê îşxal kirin û daxwaz kirin ku TV û rojnameyên Swêdî bînin bi wan bipeyivin. Ev daxwaza wan hat cih. Piştê ev Komîte çû Wezareta Karûbarê Dervayê Swêdê û ji wan daxwaz kir ku tadeya ku li girtiyan hefsan dibin, protesto bikin. Komîte çû cem Partiyên Swêd; partiya Sosyal-demokrat, Folk Partî, VPK û Amnesty ku piştgiyariya kesên ku di grewa birçîbûnê de ne bikin. Komîte di 18'ê Tebaxê de jî li ber Konso-

losxana Tirkîyê mitîngek çêkir û nameyek protestoyê da Konsolosxanê.

Piştî ku li her dera welat û li dervayî welat ji bo piştgiyariya girtiyan rayek giştî ya xurt hat çêkirin Wezîrê Adliyê yê Tirkîyê Oltan Sûngurlu beyan da û got ku "Biryarnama l'ê Tebaxê" wê bê guherandin. Û piştî 52 rojên grewa birçîbûnê girtiyan hefsan di berxwedanên xwe de bi serketin.

### "Biryarnama l'ê Tebaxê" çî bû

Biryarnamê; berî her tiştî cilên yekbabet mecbûr dikir. Rojname, kovar, kitêb, radiyo, û hwd ji girtiyan re qedexe dikir. Girtî mecbûr bûn ku bi seredanên xwe re bi Tirkî biaxfin. Girtiyan nikaribûn serbest bi awuqatên xwe re xebandin. Girtiyan nikaribûn ji derve xwarinê bînin. Seetên hewagirîna hindik bûn û hwd.

Li gor nûçên dawiyê hukumeta Ozal dixwaze qanûnên nuh ji bo girtî û girtîgehan derxe. Li gora vê qanûnê, heta salekê Meclîsa Tirkîyê ku nikaribe di heqê kesên ku cezayê îdamê xwarine qerarê bistîne wê gavê înfaza van wê bi qerara mahkemê bê cî.

### Nîşan

min re bes e. Tuyê min qet ji bîr nekî. Ez te bi ûjdanê te re bi tenê dihêlim.

Çaxa van gotinan got û derket li ber derî sekinî, çavek avêt ji wê tabloya ku bîska berê bi gulla min qul bûbû, bi xweşîkî nîşan jî negirt derbek avêtê û derket. Pîreka min xewirî bû. Pey-ên mina cesaret nedikirin ku wî bisekinînin, di nav tirsê de li pê wî dinêrin. Derket ser derena kevirî ya ber derî, deng li erebeciyê xwe kir û hîn ez nehatibûm ser xwe li ereba xwe suyar bû û çû.

Deng ji Kont biliya. Bi vî hawî min dawîya çiroka

ribû. Bîska berê bi henekî atêş kir, lê nikaribû li min xista. A nuha jî hema ji carekê de ji dilê min daxwaza henekirinê tê...

Piştî gotinên xwe qedand piyê xwe bilind kir, li ba pîreka min xwest nîşanê li min bigre. Maşa xwe avêt nigên wî. Ji hêrsan difetîsim, bi qîrîn min got:

- Maşa, rabe! Tu fedî nakî! Begê min, hûn jî devjêberdin, bi pîrekeke reben bes kêfa xwe biqewitînin. Tu atêş dikî ya nakî?

- Ez nakim, got Silvîo. Hema min ev tîrs û tertilandina te dît û tu mecbur kir ku tu bera min dî, ev ji

6-Meha pêşî ya zavatiyê.

7-Serokê Heteryayiyên ku li hember Împaratoriya Osmanî ji bo serxwebûna Yûnanîstanê serî hildabûn (wer.)



## Ji PYKP re perestroyka û glasnost divê

Hesen Mizgîn

Îro bala hemû dewletên kapîtalîst û bi taybetî jî bala hemû hêzên sosyalîst li ser welatên sosyalîst e. Guhertinên wisa dibin ku hêzên sosyalîst lê şaş dimînin, lê welatên kapîtalîst û emperyalîst jî kêfa xwe pê tînin. Serek û siyasîyên welatên kapîtalîst diaxivin, di gotarên xwe de bi dilxweşî beyana "îflaskirina sosyalîzmê" dikin. Wek nimûne jî bi taybetî Polonyayê didin.

Niha bûyerên ku li Polonyayê dibin bi rastî jî bala mirov dikşîne. Sendîka ku do qedexe bû, kadirên wê dihatin hepskirin, Îro di îktîdarê de ye. Solîdarnost do veşartî bû lê îro bûye hêzeke resmî û di parlamentoya Polonyayê (Seymen) de tê temsîl kirin. Serokê Solîdarnost, Lech Walesa îro li Polonyayê di merhela siyasî û aborî de rolek girîng dileyze. Walesa do nikaribû derketa derê Polonyayê, lê îro di berîka wî de pasaporta dîplomatîk, dikare here her welatê û bi awakî resmî jî tê qebûl kirin. Do Solîdarnost û Walesa ji alî Partiya Yekbûyî ya Karkerî Polonyayê (PYKP) bi karûbarên qirêt û li dijî dewletê dihatin îşaretkirin lê îro bi daweta Serokkomarê Polonyayê W. Yarujelskî wê hukûmetê ava bikin.

Îro Solîdarnost ne tenê di nav karkir û gundiyan, lê di nav rewşenbîr, akademîk û xwendevanên Polonyayê de jî bi hêz e. Do sendîka derket ortê lê îro di merheleya siyasî û aborî de wek partiyeke siyasî hereket dike. Wek tê zanîn serekwezîrê nuh Tadeusz Mazowieski nimîndeyê Solîdarnost e û nuha bi avakirina hukûmeta koalîsyonê mijûl e. Wisa xuya ye ku wê Mazowieskî vatîniya xwe bi zehmetî be jî bi cîh bîne.

Helbet bi hukûmetek di pêşengiya Solîdarnost de pirsgrîkên Polonyayê nayên helkirin. Rewşa siyasî û aborî ya Polonyayê hatiye deraca îflasê. Qet şik tune ye ku di hatina vê merhela nebaş de rola PYKP pîrr mezin e, berpirsiyariya wê pîrr giran e. Di daxwaza helkirina pîrs û pirsgrîkên Polonyayê de divê xwe paş de nexê û nebe ku li hember reformnên pewîst jî raweste. Ji bo vê yekê jî divê PYKP xwe bi xwe nuh bike. Divê PYKP îtibara xwe ya windakirî carek din qezenc bike. Riya vê yekê jî perestroyka ye, glasnost e.

PYKP di beşdarbûna hukûmeta koalîsyonê de hin şert û şîrûtan dide pêş, daxwaziya hin wezaretan dike û di beyana xwe ya Bûroya Polîtîk de eşkere dike ku eger daxwaziya wan bi cîh neyê wê hin bendan li derxin hember T. Mazowieskî. Di rewşek wiha de buhranên ku îro li Polonyayê hene wê kûrtir û diwartir bibin û yê ku ji rewşeke wiha zerarê bibîne jî cardin gelê Polonî bixwe ye. Ji bo afirandina demokrasîyê sosyalîstî divê PYKP bi xwe pêşengî bike ku li ba gelê xwe îtibara xwe qezenc bike.

Îro L. Walesa bi serbestî û rastrast êrîş û rexne dibe ser PYKP û hin caran jî wê twhdît dike. Di avakirina hukûmeta koalîsyonê de daxwaza Walesa ew e ku ew kesên ku wê di hukûmetê de cîh bigrin divê wek kesên reformxwaz bin, ne di forma endametiya partiyek siyasî de bin. Helbet daxwaza wî tenêhiştina PYKP ye. Îro ku PYKP bi taktîkek baş xwe nede ser helkirina pîrs û pirsgrîkên Polonyayê wê L. Walesa û hevalên wî hin bi rehetîr bêjin; "Binêrin, ne me gotibû" û li gel gelê Polonî PYKP neheq derbixin. Fersendek ketiye destê PYKP. Divê vê fersendê bi awakî zîrekî bi kar bîne, vî şansî nerevîne.

## Polonya

# Ber bi qonaxek nuh ve



Serokwezîrê nuh yê Polonyayê T. Mazowieskî

Di 25'ê Tebaxê de Serokkomarê Polonyayê vatîniya avakirina hukûmetekê da nimîndeyê Solîdarnost; Tadeusz Mazowieskî. Wî di beyana xwe ya yekemîn de got ku ewê azadiya kesan zêdetir bike, jî bo dayîna deynê derve ye pîrr wê xebateke tekûz bike û wê îmtiyazan ji holê rake.

Di rojê T. Mazowieskî de pîrsa deynê derva ya herî girîng e. Ji bo helkirina vê pîrsê wê programê aborî li gor dilê Banka Dinê (IMF) çê bike. Mazowieskî di beyana xwe de got ku ya zehmet ne avakirina hukûmetê ye lê afirandina hin şert û şîrûtan ku mirov bikaribe bi rehetî û bi awakî efektif kar bike.

T. Mazowieskî dixwaze ku PYKP jî di hukûmeta wî de cîh bistîne. Li gor wî di hukûmetê de tunebûna PYKP jî bo Solîdarnost ne mumkûn e.

Li dinê tu parti tune ye ku hem teşkilata polis bergiriyê kontrol bike û li muxalefetê cîh bigre, Mazowieskî got.

Di pîrsa reforman de Mazowieskî li ser guhertina hin rêxistinên wek nuçe, radyo û televîzyonê got; "Me divê di van rêxistinên de herkes bête temsîl kirin. Li ser afirandina demokrasîyê jî got." Emê jî bo afirandina demokrasîyê fireh gavek mezin bavêjin û di vê demokrasîyê de wê rûmet jî bo mafê insanî hebe."

Mazowieskî di beyana xwe de eşkere kir ku wê endametiya Pakta Warşowayê bidomîne û di danûstên-

tin PYKP şeş wezaret - derve, bergirî, navî, kultur, komunikasyon û serekwezîrê duemîn- dixwaze.

Rewşa aborî

Hukûmeta ku bête damezrandin vatîniyek sivik nagire milê xwe. Karberdan, mîting û protestoyên curbecur bûye perçek ji jiyana gelê Polonî. Li ber dikanan gel bi seetan li dorê radiwestin ku kiloyek goşt, rûn û hwd bistînin.

Qiymeta (nirxa) perê Polonî; Zlotî roj bi roj dikeve. di resmîyetê de dolarek 980 Zlotî ye lê di bazara reş de 8200 Zlotî ye. Eger ku hukûmeta nuh çareyek ji bo vê yekê nebîne Polonya ji îflasê xilas nabe. Rojên pîrr dijwar li ber gelê Polonî hene. Hukûmeta nuh nikare di demek kurt de pîrs û pirsgrîkên kevnare hel bike.

Polonî îro ji malên ku di bazarê de hene %20 zêdetir mehanî û subvînsiyon distînin. Ango li gel gelê Polonî pere gelek e lê xwarinên pêdivî kêm in. Lê belê zêdekirina nirxa xwarinê û hwd zahmetiyek mezin peyda dike. Eger bi vî awayî here wê gelê Polonî ji alî aborî ve qeweta xwe winda bike û xizanî wê destpêbike.

Ji niha ve karkir ji halê xwe ne razî ne û nerazîbûna xwe bi karberdanan nîşan didin. Karberdan di vê rewşa xirab de tesîreke negatîv dide aborîyê û li gor lêkolîna ku hatiye kirin hilberîn ji bo mehekê %2 dikeve. Li hember hukûmeta nuh vatîniyên herî girîng peydakirina balansa di navbera pêşdeçûn û hilberînê de ye. Ev yek jî ne hinde hêsan e, ne karê rojekê ye.

## Li dinê de ev meh

**-Libyayê di 1'ê İlonê de 20 saliya şoreşa xwe pîroz kir. 20 sal berê di pêşengiya Muammer Qaddafi de li dij Giral İdrîs derbeyek leşkerî hat kirin. Piştî wê derbeyê Lîbya ji qiraliyete derket navê wê bû Cemaweriya Ereba Gel a Sosyalîst a Libyayê.**

-Di 1'ê İlonê de seet 12'an de li hemû dinê ji bo biranîn û hurmeta yên di Şerê Cihanê yê Duemîn de hatine kuştin sîren û zengilên dêrê bi hev re lîxistin. Di vî şerî de nêzi 50 milyon insanî hate kuştin.

**-Partiya Komunîst a Finlandiyayê ku di sala 1918'an de hatibû damezrandin sala ku bê wê xwe bela bike. Yekîtiya Demokratîk a Gel- rêxistinek çep e- jî sala ku bê wê xwe bala bike. Herdu hêz bi hev re wê partiyeke nuh damezrînin.**

-Di 8'ê İlonê de FMLN û hukûmeta El Salvador ji bo destpêkirina gotûbêja aştiyekê li hev kirin. Serokkomarê El Salvador Alferdo Kristianî ji bo gotûbêja bi FMLN (Eniya Rizgarî ya Netewî ya Farabundo Martî) re komîsyonek ji wezaretan pêkhatî damezrand. Gotûbêja wan wê li bajarê Meksîko City di rojên 12-13'ê İlonê de pêk bê.

## Fîşa abonetiya Armancê

Salek

Şeş Meh

Abonetiya salekê

120 Skr. 120 FF. 20 \$ 35 DM

Tarîx: .....

Nav û paşnav: .....

Navnîşan: .....

Welat: .....

Postgiro: 50 37 99-9 Sweden

Heqê abonetiya xwe li ser postgîroya jorê bişînin. Fotokopiya kvîtoya heqê abonetiye û fîşa jorîn dagirin li ser adresa jêrîn ji me re bişînin.

Adres: P.Box: 6004, 172 06 Sundbyberg/Sweden